


# Kulîlka Ciwan

Kovara wêjeyî, çandî û hunerî

Gulan 2003

Hejmar. 1

1.500.000 TL



## n a v e r o k

Pêşgotin	1	Kulîlka Ciwan
Hebhinarê	2	Sîraç AKTAŞ
Meha Keskesorê	6	Çiya MAZÎ
Lome dikim	7	Yildiz ÇAKAR
Lib bi lib	8	Bertav RIZGAR
Neynikên evînê	8	Jarîn SOTÎN
Awirên Nemirnejî	9	Şakîr OZAYDIN
Ji Îsmail Beşikçi re	11	Abdhalim MALLAMOHAMED
Xewna du bilbil û xalîçeyek	12	Receb DILDAR
Rawestgeha Xewnerojkan	13	Qasim SERHEDÎ
Tu yê kengê vegeerî?	14	Zozan KAYA
Tenêfî	15	Nîhat ÇELÎK
Melayê Cizîrî (1589-1664)	16	Sîraç AKTAŞ
Darên zarok	20	Mem BAWER
jiyanên hevpar	21	Amed Ç. JIYAN
Hêza te	24	Nenas DILDA
Tewafkirina te	24	Evin RONÎ
Der heqê Sobarto de	25	Ridwan FELAT
Ewrên tarî	28	Serhad RÊNAS
Malşewitî	29	Derwêşê LAL
Ku şiyar nebe şiyarî	33	Serkeft BOTAN
Dilopên Pênûsa Min	34	Azad JIYAN
Navên kulîlkan	35	Êhmed DIRIH
Diyarbakur Kalesinin Tarihi Seyri	36	

## Kulîlka Ciwan

Kovara Mehane (Aylîk Dêrgî)

Sal: 1 Hejmar: 1 Gulan 2003

Xwedî û Berpirsiyarê Nivîsaran:  
Sîraç AKTAŞ

Redaksiyon: Sîraç AKTAŞ  
Şakîr OZAYDIN

Çapxane: Petrol Ofset

Rûpelsazî: Aksa Grafik

Bançe:

Sîraç AKTAŞ

Hesab No: 8303 0286298

Îş Bankası Ofis Şubesi - DİYARBAKIR

Navnîşan:

Înönü Cad. Magül İş Merkezi

Kat: 1 No: 66

Dağkapı-DİYARBAKIR

E-mail:

kulilkaciwan@hotmail.com

kulilkaciwan@inbox.net

## Xwendevanên hêja,

Di vê pêvajoya mîna geliyekî teng bûye û mîna beriyekê jî ber lê fireh bûye de, em bi hemû hêviyên xwe yên xurt xwe bi wêje, çand û hunera xwe ve girêdidin... Ev girêdan divê di her warî de bi bîr û bawerî pêk bê. Lewre gengeşî û listikên ku li ser Rojhilata Navîn têne listin me ber bi vê yekê ve dikaşkişîne... Her wiha me ji weşanên xwe yên heyî jî "bêguman" hêzek girt. Lê belê, li gorî bîr û baweriya me, bi derketina kovara Kulîlka Ciwan re emê karibin hêza weşanên xwe xurtir bikin û bi her awayî piştgiriye bidinê... Ligel vê yekê jî em Kulîlka Ciwan di warê wêje, çand û hunera kurdî de wekî hêzeke katalîzor dibînin, lewre Kulîlka Ciwan ji dilê Mezopotamya dirêşînin ser vê erdnîgariyê...

Di van rojên ku ji her demê bêtir pêwîst e em biratî û aştiyê derxin pêş de, em we hemûyan bi bêhna hemû cureyên kulîlkên Mezopotamya hembêz dikin. Lewre hemû kulîlk her dem ciwan in û xweşbêhn in. Hûn jî her mîna kulîlkekê ciwan û xweşbêhn bimînin...

Dilên we her bê şewat; bi rengên kulîlkan ciwan, bextewar û tijî hêvî bin.

# hebhinarê

Berhevkar: Sîraç AKTAŞ

Li welatê mîran, jin û mêrek hebûn. Zarokên wan qet tune bûn. Li wî welatî ne hekîm mabûn ku neçûbûn cem, ne jî derman mabûn ku bi kar neanîbûn. Dîsa jî tu zarokên wan çênebûbû...

Rojekê jinik diçe serê kaniyê û li qiraxa rê hebeke hinarê dibîne... Bi awayekî ku dilê wê bibijê lê dinihêre û dibêje; "Oy hinarê, xweş hinarê tu çi qas xweşik û şêrîn î. Ku rojekê Xwedê keçikeke wekî te xweşik û şêrîn kir nisibê min ez dê navê wê deynim 'Hebhinar' ". Û heba hinarê davêje devê xwe...

Sal derbas dibin, jinik dibe ducanî. Piştî neh meh, neh roj û neh saetan Xwedê keçeke ji heba hinarê xweşikîr didê. Jinik jî navê keça xwe - wekî ku soz dabû - danî Hebhinarê.

Te digot qey her roj ku diçû ava, xweşikahiya xwe ji Hebhinarê re dihişt. Roj bi roj rûkê wê geş dibû. Her roj ji ya borî rindiktir dibû. Sal di ser salan re diqelibîn, Hebhinarê jî mezin bûbû. Edî sêz-deh-çar-deh salî bû. Keça xama bû. Diya wê jî bi nexweşiyê giran ketibû û çendekî piştî nexweşiyê çû ser dilovaniya xwe. Li duv mirina diya wê, ew û bavê xwe bi tenê mabûn. Hemû kar û barên malê ketibû ser milên wê.

Karê hundirê malê de bi çi awayî ba bi tena serê xwe dikir. Û karên derveyî malê jî, cîrana wan hinekî alîkariya wê dikir. Gava ku diçûn newalê qirş û qal berhev dikirin an jî diçûn serê kaniyê cil û berg dişûştin, cîrana wan ya jinebî alîkariya wê dikir. Keçeke wê jî, bi temenê xwe ve hevala Hebhinarê hebû.

Hebhinarê êdî bi tena serê xwe dikarîbû hemû karê malê bikira. Ligel xweşikbûna wê, karê wê jî ew qas xweş û paqij bû. Gava ku karê malê diqedand, diçû qirş û qalan an jî serê kaniyê da ku cilan bişo.

Rojekê ku jinika cîran û Hebhinarê bi hev re çûn serê kaniyê da ku cilan bişon, di rê de ji Hebhinarê re dibêje; "Hebhinar, ma çima bavê te nazewice? Jixwe çend salan şûn ve tu yê jî bizewicî û biçî, ewê dîsa bavê bi tenê bimîne." Piştî vê gotinê kêliyêkê bêdeng ma û duv re jinikê got û dom kir. "Ku ew qala zewaca xwe nake, dibe ku fedî jî dike. Tu pê re bipeyive û bila ji xwe re li jineke rind bigere."

Tu nebêje cîrana kone, çav bera bavê Hebhinarê daye. Lê Hebhinarê wê demê tu tişt fêhm nekiribû. Piştî şûştina cilan veqeriyên malê, Hebhinarê bi dilekî saf ji bavê xwe re got: "Bavo, Piştî ku diya min çû ser dilovaniya xwe, tu jî tenê mayî. Çend salên din ezê jî herim. Tu yê dîsa tenê bimînî." Bavê wê jê re got; "Keça min, heta van cilên diya te yên bi darvekirî nerizin, ez nazewicim."

Hebhinarê êdî tu rê nedît ku bide ber bavê xwe. Bû roja din ku ew û cîrana xwe bi hev re çûn newalê qirş û qalan berhevkin, jinikê jê pirsî ku ka wê û bavê xwe çi xistibûn serê hev. Bavê wê çi jê re gotibû, Hebhinarê jî ji cîrana xwe re ji serî heta binî rêz kir. Li ser van gotinên Hebhinarê, jina bî jî wisa berdewam kir; "Keça min, Hebhinarê tu dizanî emê çi bikin? Tu her roj cilên diya xwe bîne, emê bibin bi cilan re bişon û bi şûnikan bikutin, da ku zûtir birizin û bavê te jî biryara zewaca xwe bide.

Hebhinarê bi ya wê kir, her roj ew cil bir şûştinê û bi şûnikê darîn kuta. Bi wî awayî di demek kurt de riziyan.

Û rojekê Hebhinarê bi destê bavê xwe digire û dibe ber cilên diya xwe yên rizandî. Cîrana wan xwe ew qas li ber çavên wê xweş kiribû, êdî Hebhinarê jî dixwest di demeke zûtirîn de bi bavê wê re bizewice. Û ji bavê xwe re got: "Bavo, te digot heta cilên diya te nerizin ez nazewicim. A ji te re cilên diya min ên riziya." Bavê wê bi lêniherîna cilan re got: "Keça min a delal, belê; cil riziya de ka ezê bi kê re bizewicim? Ma di rojekê de mirov dikare jineke rind bibîne û bizewice?" Hebhinarê dabû lezê û got; "Jinika cîrana me... jinika cîrana me... ew jî bî ye. Ji min jî pir hez dike. Û dilê wê jî..." Bavê wê di nava hestên xwe yên tevlihev de got; "Baş e keça min, ku tu jî ew qas dixwazî û ew jî bixwaze û bibêje erê ezê bizewicim." Piştî wan gotinan Hebhinarê mizgînî gihand cîranê. Û çend roj şûn ve bavê wê û jinika cîran zewicîn. Pêşîn damariyê wekî keça xwe ji wê hez dikir. Lê çawa be jî damarî bû ne dê bû. Her ku çû, jinikê li bedewiya Hebhinarê dinihêrt; Çavên reş yên her dem kikirî, ku porê wê li ba diket dibû mîna pêlên zeryayê, dev û lêvên hunguvîn, sîng û berên bi bêhna gulên biyanî û bejna wê mîna şitla rihanê, xortên çeleng ji dora mala bavê wê kêr nedikirin, didît. Û li keça xwe ya bi temenê xwe ve hevala Hebhinarê ya reşik û kupusî dinihêrt, ji kerba diheliya û diçû. Her wiha keça wê jî dikeribî.

Ji ber vê rewşê ji Hebhinarê dihesidîn. Û her roja ku diçû ava, Hebhinarê jî li ber çavên wan reş dikir. Êdî di rewşeke wisa de bû damariya wê tehemûl nedikir ku pêjna wê bibihîse. Li dek û dolavên mirin an jî ji holê rakirina wê digeriya. Lê çawa, bi çi awayî?

Rojekê ew, damarî û keça damariyê bi hev re çûn çolê. Jinikê bi konefî du şerbik tije av kir. Yek ji wan nû û ava sar (cemidî) tê de bû, yê din jî kevn û ava germ bû. Da(mar)iya kone çêlmarekî bera nava av şerbikê nû dide û wî şerbikî dide Hebhinarê bejnzirav. Gava ku Hebhinarê avê bi serê xwe de da dike dibêje; "Axx!.. wekî ku tiştêkî xerîb têkeve nava hinavên min." Damarî bi hêrînî dibêje; "Tu hîna çi dixwazî qereçî! Ma min ava sar û di şerbikê nû de neda te? Hiş be, qereçî!"

Hebhinarê dengê xwe nake û vedigerin malê. Wî çêlmarî xwe bera nava hinavên wê dabû. Her roj bi xwîna wê mezin dibû. Ji bo wê yekê jî zikê Hebhinarê pê bi pê mezin dibû û dinepixî. Damarî ya wê dawîya dek û dolavên xwe neanîbû. Îcar jî ji bavê wê re dibêje; "Binihêre keça te çi anî serê me, hê li mala te ye ducan maye. Wî pepûkê! Serê me serê saza ye, emê bibin sosret li nava dost û cîranan. Ev yek dê me bênamûs bike. Na na! Divê tu keça xwe, bi çi awayî be jî bikujî û xwîna wê tole bîne ezê vexwim." Bi gotina wê re agir bi dilê mêrik ket. Lê neçar mabû. Keça wî hîna azîp bû, di mala wî de ducan mabû... Jinikê wisa digot.

Her ku bavê wê, çi qas li ber diket jî, bi ya jina xwe kir. Hebhinarê da ber xwe, berê wê da derveyî gund û gelekî dûr ketin. Li binê darekê rûniştin û bavê wê got; "Keça min here, destê min nageve re ku ez te bikujim. Tu keça min ya bi tenê yî, piştî koçkirina diya te, ez û tu tenê mabûn. Lê ez çi bikim... Divê te em nexistibana vê rewşê, divê te ev tişt nekiriba. Îcar biçe, dûr here ku em qet hev nebinin."

Hebhinarê ji kerba dev li laşê xwe dikir. Lewre ew ne ducan bû. Lê di wê rewşa nepixandina zikê xwe de nikaribû bipeyitand jî. Bavê wê ew li wir berda û fitilî gund. Bi rê de kerguhekî digire, ser jê dike, xwîna wî tîne û dide xanima xwe. Hevsera wî fêr dike ku ew xwîn ne xwîna Hebhinarê ye. Lê dîsa jî ji ber çûyîna wê kêfxweş dibe.

Hebhinarê hejar, ji derd û kulan bi çolan dikeve. Pir hindik diçe, xwe digihîne serê kaniyêkê. Ji tî bûnê bêhnfetiskî bûbû. Dema xwarî ser avê dibe ku vexwe, çêlmarê ku a niha bûye marekî mezin xwe dilivîne. Marek jî di nava avê kaniyê de bû. Yên nava avê ji yê nava hinavên Hebhinarê re dibêje:

- Were nava kaniyan, nava gul û sosinan. Tu çi dikî li nava wan rêvî û rendalan.

- Na na! Vira çêtir e. Tu were nava xwîn û gilêzê, cihê germ, xwarina amade.

Lê marê kaniyê pir israr dike û marê me yê tiral xwe berdide nava kaniyê. Di wê kêliyê de Hebhinarê bi derketina mêr re bêhiş li ser piştê dikeve. Piştî demekê ku êdî hatibû ser hişê xwe, herdu maran di nava avê de li hev dixistin. Bi hev ve radipelikîn. Da ku yek yekî têk bibe. Lê di dawiya dawîn de, herdu jî mirin û kanî bi xwîna wan sor bû...

Hebhinarê radibe ser xwe û ava kaniyê paqij dike. Dûv re hildikişê ser dara li ber kaniyê. Xweşikahiya wê li ser avê dixuye. Çêlmar jî derketibû ji nava hinavên wê. Her ku kî diçû ser wê kaniyê, li şewqa wê hay dibû. Û rojekê kurê mîr, bi hespa xwe tê, da ku hespê av bide. Hespa wî çav li şewqa Hebhinarê ket û bi hêrînî şûn-ve vegeya. Gava ku kurê mîr lê hay bû, çû hinda wê. Hiş û aqil ji serê wî çû. Çav li bejna zirav, çavên mîrkuj, sîng û berê bihûştî ket, bi destê tîlîzirav girtibû. Bêhiş ketibû û lawik got;

- Ey keça delal, tu çi kes î, çi digeri li van deran. Were! Nereve ji min. Ez kurê mîr im.

Û Hebhinarê dadikeve, bi şermokî çiroka ku di serê wê re derbas bûye jê re dibêje. Kurê mîr dilêşî bûbû. Kêliyêkê ji cihê xwe tevnegeriya. Dûv re xwe negirt û got; "Te xwîna di rehên min de har kir û bi çolan xist." Lawik tu carî keçeke wiha rind û delal nedîtibû. Soz dide wê û dibêje; "Ezê vege- rim û werim te bibim. Ez diçim haya mîrekîyê pê dixim û tîm te dibim, dikim siltana qesrê."

Hebhinarê dixwest piştî ew qas tiştên ku hatibû serê wê, giş bi awayekî ji bîr bikira. Her çiqas wê lawik nas nedikir jî jê bawer kir û li wir ma. Lawê mîr li hespa xwe siwar dibe û diçe. Hebhinarê jî vedigere ser dara xwe. Kî tê serê wê kaniyê û vedigere, qala şewqa Hebhinarê dike. Li ser van goti- nan, keça damariyê fêr dike ku ew şewq a Hebhinarê ye. Dikeve rê û diçe serê wê kaniyê. Dibîne ku rast e, ew kes Hebhinarê bi xwe ye. Dibêje; "Ma tu nekuşt, ne wisa? Tu li vir çi dikî?" Hebhinarê dibê- je; "Xwişka min, ez di dexlê te de me, dest ji min berde. Jixwe nema ez vedigerim malê. Kurê mîr, dê bê min bibe qesra xwe û bi min re bizewice." Bi van gotinên Hebhinarê re, çav li serê keça demariyê mezin dibe û ji nişka ve xencara xwe li dilê Hebhinarê ye ku tije xem bû dixê û dike. Wê ji holê radike û li dewsa wê rûdinê. Xwîna Hebhinarê bi darê de herikî bû. Li cihê ku xwîna wê pê de heri- kî bû, şaxekî nû şîn tê.

Dem derbas bûbû, kurê mîr û berbûyên wî tîn da ku Hebhinarê bibin. Lê lawik dibîne ku şew- qa wê ne xuya ye. Gazî dikê;

- Delal min were, ez hatim.

Keçik peya dibe, yêr bi lawik re hatibûn hemû matmayî dimînin. Ev keç û ya wî qal kiribû, qet berbihev nedîçûn. Lawik zanibû ku, ew ne Hebhinarê ye. Jê dipirse;

- Tu kî yî? Tu ne ew î.

Keçik wekî ku xwe xweşik bibîne;

- Mîrê min ez im. Ez Hebhinar im, te soz dabû min...

- Lê tu ew qas ne reş bû?

- Mîrê min, li ber tava havînê qemirî me.

- Lêvê te ne qelaştî bûn?

- Mîrê min, hingî min bi tiliyê xwe li lîvên xwe daye, da ku kurê mîr dê kengê were.

- Paniyên te çima qelişîne?

- Mîrê min, min bi lîngan li darê dida, da tu yê kengê werî.

Kurê mîr êdî nikaribû, nebira. Ew qas berbû û siwar anîbû. Yêr ku bi lawik re hatibûn, wê çî- bikirana? Ji neçarî rabûn keçik bi xwe re birin. Yekî ji wan ji hêrsa, ew şaxê ku bi xwîna Hebhinarê şîn hatibû, jêkir û avête erdê... Ew şax dibe kevokeke dilbikul û li ser girdika milên kurê mîr dilûse. Keça damariyê fêr dike û pê aciz dibe û bi kurê mîr dide kuştin. Dûv re ew kevok dibe caniyek û

bi pey wan dikeve. Gava xwe digîhînin qesrê, keça damariyê canî jî di hewşa qesrê de dide serjêki- rin. Wê gavê, cihê ku xwîna canî lê herikî darek lê şîn tê û ew dar di hewşê de her mezin dibe.

Piştî zewaca wan, zarokê wan çêdibe. Zarok li ber dilê diya xwe pir şêrîn e. Her çavê bûka mîr li dara hewşê dikeve, dikeribe, pir aciz dibe, lê nikaribû bigotana ez ne Hebhinar im jî. Radibe ji mê- rê xwe re dibêje; "Bi çi awayî be, divê tu vê dara di hewşê de bide birîn û jê ji lawê min re dergûşê- kê çêbike.

Kurê mîr radibe gazî darbiran dike, darbir bireka xwe dide darê da ku bibire, dar dinale; "Min ne birin, min nekujin." Darbir dest darê nadin û ji wir dûr dikevin. Li ser vê yekê bangî darbirekî ker di- kin, da ku nalîna Hebhinarê û axîna wê nebihîse. Darê didin birîn û ji wê darê dergûşekê ji lawik re çidikin.

Piştî demekê nalîna Hebhinarê ji darê dergûşê tê û nahêle cih di lawik bikeve. Jinik radibe dergû- şê davêje agir, dişewitîne. Xweliya dergûşê dibe nîka teşiyekê. Û li ber şibaka mala pîrê dimîne. Pîrê jî bêkes û tenê ye. Gava pîrê ji mal derdikeve, ew nîk dibe keçeke zirav î bejnbiind. Ew keç Hebhinar bi xwe bû. Û hemû karê pîrê diqedand û dîsa diçû ber şibakê. Rojek du, sê... pîrê kete gumanan. Di- zanibû ku yek tê mala wê paqij dike. Lê kî bû? Her ku ji mal derdiket, hemû kar di cih de bû, lê gava ku dihat kar nemabû. Pîrê rojekê xwe di hundirê malê de veşart û xwe da benda wê/wî. Piştî demekê dît ku, nîkek ji ber şibakê ket erdê, bû keçeke rind û dest bi karê wê kir. Pîrê hêdî bi destê keçikê di- gire û dibêje; "Tu kî yî, tu çi kes î, ev çi rewş e keça min?" Hebhinarê jî dibêje; "Ez Hebhinar im, bêkes im." Pîrê berdeyam dike û dibêje; "Keça min ez jî tenê me. Neçe tu deran, êdî ez diya te, tu jî keça min. Ez nahêlim kesek te bibîne jî."

Hebhinarê bi pîrê bawer bû, li mala wê ma, bi hev re jîyan. Demsal dizivîrîn û ber bi zivistanê ve diçûn. Êdî terş û tîrûşên li çolê dihatin mal, li mal dihatin xwedîkirin. Rojekê kurê mîr -zilamê keça da- mariya Hebhinarê- çend hespan tîne û her malekê yekî dide wan, da ku zivistanê xwedî bikin. Hebhî- narê bi vê yekê dihise û zorê dide pîrê, da ku ew jî yekê ji bona xwedîkirinê bîne. Pîrê çiqas li ber xwe da jî, ji ber Hebhinarê nekîr der û diçe dixwaze, kurê mîr dibêje; "Pîrê tu nikarî, xwe xwedî bikî. Ma tu yê çawa, vê zivistanê hesp xwedî bikî?" Pîrê bi biryar bû, divê yek bibira. Ew jî radibin, yeka ku ew jî pê ne bawer in ku xwe bigihîne biharê didinê.

Pîrê hespê xwe tîne malê û Hebhinarê bi destê xwe xwedî dike. Hespê roj bi roj qelew dibe. Piş- tî ku qewlê wan diqede, kurê mîr li malan digere û yek bi yek ji malan berhev dike. Gava ku tîne ma- la pîrê, bawer nakin ku hespê pîrê hîn hebe. Jina kurê mîr jî bi wan re ye. Pîrê hespê xwe tîne hem- ber wan. Hesp hingî ku qelew bûye, hemû kes matmayî dimînin. Û kes nikare serî bi hespê re derxe. Jina wî fêr dike ku, ev ne karê pîrê ye û tiştêk di vî karî de heye, dibêje; "Kê ew hesp xwedî kiribe, ewê karibe pê. Kî ye, bila zû were." Di wê kêliyê de, Hebhinarê bi hemû nazdarî û xweşikahiya xwe di deriyê pîrê de tê. Destê xwe dide ser piştê hespê û hesp paşê xwe dide jina kurê mîr, di nava rêx û çirava xwe de zîtokekê li devê wê dixê.

Kurê mîr, ji çavên xwe bawer nake. Lewre ew keç Hebhinar bû. Piştê li Hebhinarê dinihêre û di- bêje; "Hebhinar, tu nebêjî qey ez nehatim. Ez hatim lê tu ne li wir bû. Neçar mam vê ya hanê bibim. Min berbû jî anîbû serê kaniyê. Hebhinarê jî got; "Ez dizanim mîrê min" û çî li ser kaniyê qewimî bû, yek bi yek rêz kir." Û kurê mîr, di vê navberê de bi awirekî tûj, li jina xwe nihêrt... Li Hebhinarê zi- virî û berdeyam kir; "Hebhinar tu yê min bibexşînî û tu yê bi min re bizewicî an na?" Hebhinarê jî got; "Mîrê min, daxwazeke min jî heye." Kurê mîr, ji hemû daxwazên wê re amade bû.

Daxwaza wê jî, divê kurê mîr; hespek tî û yek jî birçî bihiştê û keça damariya wê bi wan ve gi- rêbida. Dû re berê yê tî bida çem, yê birçî jî bida kadînê. Kurê mîr ev daxwaza wê anî cih. Çil roj û çil şevî, bi def û daholan dawet li dar xist û hinekî dereng be jî gihîştin mirazên xwe... ❖

## Meha Keskesorê

Sebra xwe î te dikişand  
ji hinavên dilşikestî

berî ewrên çilesrî  
berî zîpîkek bêbext  
berî av bigire ser rê  
heyşt hilman jê bigihîne min

di biharê de diyar dibin  
xweşî û nexweşiyên min

li ser devê min şanzdeh kevir  
çeçeq nayê ji diranê min  
destmalên ciwan paqij dikin hêsirên min

bi biryar im biqetûnim qeyd û merbetên xwe  
bi biryar im û nêzîk maye adar

were...

binûhurîne li ber serê min  
bîst û carekê bilîrîne  
bila dengê te bê min  
bi bêhna panzdeh hezar bilbizêk re  
bişîne şînika xwe î bi qul  
ezê bi porê kurê xwe vekim

were...

berî zewêdiyên keskesora bi dizî  
berî tarî têkeve erdê  
bigihîne min şewqa xwe  
û bike bist û heyşt perçe tavê  
bila germ bibim  
bila germ bibim ji awirên te

Çiya MAZÎ

## Lame dikim

Yıldız ÇAKAR

Vegere! Bêriya te dikim. Niha di bin heyva nîvmehî de me. Li gulistanekê me. Û ez gu-  
leke tenê me. Bê stîrî me. Diqefilim. Bayê tazî canê min diêşîne...

Hêleke min winda ye niha. Wek nalekî di binê bîreke bêbinî de, wekî goristaneke bê  
xwedî. Li xwe digirim. Li qîzîtiya xwe. Nifirên te bi cih hatin dayê, niha li zaroktiya xwe di-  
gerim li ser laşê te yê sar. Porê min di nava xwînê de hine dibe. Û destmala diyarî ya ku di  
paxila biçûk de... Tu dizanî, şîn carinan zivistanê jî tê, wekî bihara bê nav.

Nivîsta li ser pêsirên xav niha dike kûrîn har bi har. Tu dizanî, hêstir xwe ber dide dil û  
li wir dike ûreûr...

Ev çi dil e?

Derya ye an çavên te ne?

Li bendê me, li ber derî me. Çavên min li derî ye, guhên min li fizîna bayê... Tê bîra te  
li qesrê, li ba xaniyê zer, li quncikê min her du destên xwe li stûyê te digerlandin û min ma-  
çek dida pesîra te.

Ma nayê bîra te! Min got neçe dayê. Ger tu neçûya dê dengê min bihata te. Min got ne-  
çe!

Niha ez bi kemaniya xwe reş û spî me û qedereke ne tamamî me. Min xêz bike dayê  
min binivîse û bibihîze.

Çima tîm redkirin!.....

Lê! dayê ma qey te nedît niha porê min spî bûye. Min digot ezê nebim derewçînên xe-  
yalên xwe. Min digot ezê her dem zarok bimînim di paxila te ya germ de. Niha derewçînek  
im. Wekî te! Çima tu hîn li asîmanan bi stêrkan re digerî. Çima destê min nagihîje te? Çima tu  
hîn sar î dayê. Tu zanî zivistan xeyidiye, niha bihar e. De bê dayê! bila pelên daran gul ve-  
din. Niha çûkên penaber jî vegeyriyan malên xwe. Niha li ser banê me şa dibin dayê şa! Çiya-  
yê dilê min, kerba min.

Wekî rojekê ji rojan dilê xwe veke. Min bipêçe wekî bîst û sê sal berê, bixe hambêza  
xwe. Tu jî ramûsanekê bide sînga min. Destê xwe di porê min bide û dîsa birêse guliyên reş.  
Bila wekî rojên berê behna te min sermest bike û ji bilî min bila tu kes tunebe di dilê te de.  
Tu zanî dayê dilê min jî wekî dîroka welatê min hate firotin bi du qurîşan. An destê xwe bi-  
de min an jî careke din li biranînên min neqelibe. Ji ber ku... ❖

## Lib bi lib

li havînên min qelmek digerlandin  
di berbanga şewata bênderekê de  
ne wekî havînên min ên borî  
ku qelma bê misas  
û melaxma bê milêw

di bayekî fetisokî de  
di adara Çarçira de berba dibûm  
da ku azad bibim  
lib bi lib...

êdî zivistanên têreberf  
dibin berbanga buharê min ên heyf  
û tewlê min diguherînin  
di mêngên xweza evînan de

an jî tov im  
di pêşa cotkarekî şidiyayî de  
da ku azad bibim  
lib bi lib..

Bertav RIZGAR

## Neynikên evîne

bûdîstan di libek hinarekê de didîtin dinyayê  
ez jî di tunebûna lîlikên çavên te de...  
bi rûpelan neynikên evîne diafirînim.  
û di van neynikan de aş dikim tîbûna xwe  
gerdûnê bi vî awayî fêm dikim û dixwînim

ger tu di qemika êvarê de,  
rohnîkirinek rohnîya çavên xezalekê ba,  
minê tu dîsa bixwesta...

...dîsa jî te dixwazim,  
tu yê di rûpela jiyana min de  
têbinîyekî bimînî her dem.  
tu ji min him dûrî

him nêzîkî,

him jî bêrîkirina min î.  
tu gula dawin a li ser axa min a bejî yî.

Jarîn SOTÎN

## Awirên Nemirnejî

Şakîr OZAYDIN

Ax ew bajar!

Ew bajarê gerdanreş.

Ew bajarê ku mirin û jiyane di nava xwe de dihewîne...

Tu ji bona me çi diramî, te çi dafikan çekiriye.

Şevreşkên dojhê dasên wan di destên wan de û li kuçeyên vî bajarî li boraqan digerin.  
Êdî kuçe kuçeyê nas nake, mirov jî mirovan. Şûrê bêbextiyê ji ku de tê ne diyar e. Di van  
alûleyan de, bi tirsakî gavan davêjin mirovperwer. Ling tédikoşin, li hemberî bêdengiya axê.  
Ax şil dibe, ji hêstirên miriyan. Nûzîniyek olan dide, di vê goristana zindiyan de. Bajarekî bê  
çira, ku cîrantiyeke neçarî bi miriyan re dike. Ev bajar, ji ber vê hovîtiyê êdî ji xwe fedî di-  
ke...

Çawa mirovên bi vî rengî di dergûşa xwe de hejandiye.

Rûyên rûpûşkirî roj bi roj zêde dibûn. Her roj mêrxasên mîna çiyayan hildiweşiyên. Xwî-  
na sor di gewriya wan de hişk dibû. Lê bi her pel weşandinê re bawerî zexm dibû. Rik û kî-  
na li hemberî xinisan berztir dibû. Qêrîna azadiyê olan dida, di gerdana vî bajarî de. Zarokên  
dilgeş, ji bona ku li lûtkeyên herî berz ji xwe re cih bigirin û ji bona ku bi êgir re bikevin  
reqsê ketibûn nava pêşbaziye.

Êdî ew bûbûn kevok û bazên dil bi kul, stêrkên nû ciwan. Di nava ewrên erjeng de dest  
bi rêwitiyê dikirin. Di rê de li hember xweşikahiya wan hemû Yezdan dihesidîn. Brûsk dişî-  
qiyân, tofan radibû. Ji ezmanê şîn, rik û hesûdî dibariya. Sînga axa wan diqelişî, cerga wan  
diperitî. Lê tu hêz nedikaribû li hemberî wan bibe asteng, ji ber ku cegera wan wekî pola bû.  
Roja rastîn, ji bona wan her dem rênîşander bû.

Di dilê wan de,  
 di mêjiyê wan de  
 û  
 di jiyana wan de...

Lê ji bona wan ne xem e; ji ber ku evîneke nû, jiyaneke nû li benda wan bû. Û ew her du hêmanên ku ew dişopandin, ji berê zêdetir li wan bandor dikirin. Ev hêman ji dil derdiketin û dil diguvaştin. Di cihê gengeşiyên di dilê wan de, aramî zîl dida. Ling û çongên wan dişidiyan û şîmaqek li rûyê bêbextiyê xistin. Lê, şîmaq şîmaqêke kurdayî bû....

.....

Bi dîtina wî re ronahî û hêvî li deşt û çiyayan belav bû. Bi deleliya xwe mirov sermest û bi zanebûna xwe mirov şareza dikir. Bi awirên xwe yên tûj, mirov nemirnejî dibû.

Roj dema ku ew didît, ji fediya xwe vedîşart. Di şevên reş î tarî de, hîvaçardeşevî ji wî dihesidî. Ji bona wî xweza xwe diguhert. Zivistan dibû bihar û gul dibişkuvîn. Dar û nebat ji nû ve zîl didan. Pîvok û batînok der dibûn, kulîlk zer dibûn. Ji bo ku ji xewê şiyar nebe, dîkan azan nedidan. Tavê xwe bi şermokî berdida ber şibakeya wî, da ku nekevin navbera wî û nîgaşên wî.

Ew bengiyê jiyane bû û mirovhez bû. Wekî Îsa..... dikaribû hemû êş û kulên mirovan-tiyê hilbigirtana....

Û di encamê de hilgirt ji. Hilgirtineke bi egîdî, hilgirtineke bi mîrxasî... Lê ew qas ne hêsan bû. Zebaniyên ber deriyên dojhê li ser kar bûn û her dem tarîtiyê diparastin. Derd û kulê wan roja rastîn, roja xwedawendî bitemîrînin. Gurên dev bi gilêz, ketibûn nava dîlane-ke derewîn. Lê ev dîlan, ji wan re bû arîxetik û kêfa wan di gewriya wan de bû girêkeke ko, da ku careke din venebe...

Êdî keştiyên zingargirî ji nedikaribûn bibin asteng, ji delfînan re... Per û baskên wî ser-ridîn. Di qirnê bîst û yekan de, zayîna sêyem pêk anî...Êdî ew bi xwe bawer bû, xwedî vî-neke zexm bû. Hewl da xwe û dest bi firîne kir. Li asîmanan peyase kir û bi şewla xwe û bi bîrdoziya xwe ya kûr Ehrîman têk bir. Hemû Yezdanên rikeber matmayî man. Rûyê Ahura Mazda bişirî. Ji wan her du hêmanan ken û coş difûriya.

Êdî ew balindeyê ku hatibû baskokirin, wekî bazekî li asîmanan digeriya. Lê, hêlên xwe yê kevoktiyê ji ji bîr nekiribû. Di nava per û baskên wî de gulên kesk, sor û zer dibişkuvîn û vê axa birîndar ji nû ve dixemiland... ❖

## Ji Îsmail Beşikçi re

Tu kî yî,  
 tu çî yî,  
 tu çî divê?

Pênûsa te  
 ji ronyê ye  
 Tariyê  
 ji nav milletan  
 hiltîne  
 Rêçan vedike  
 û  
 bi gulan dixemlîne,

Reşbûna dilên  
 Şovenîstên xwînrîj  
 diyar dike,  
 dihetikîne  
 Rûpelên reş  
 ê dijminatîyê  
 diqirîne  
 û li cihên wan  
 rûpelên dostaniyê  
 dinivîsîne.

Dihêle  
 Ko her du millet  
 Rûyên hev ramûsin  
 û hêstirên hev  
 ziwa bikin  
 û gulan bidin  
 destên hev  
 û tîfkên rûyên  
 şovenîstên  
 şerxwaz  
 û  
 xwînrîj,

Heye, tune ye  
 tu yî  
 Pêxemberê  
 aşî  
 û  
 dostaniyê ye.  
 Ji zêr nehatiye  
 çêkirin  
 heykelê  
 te.

Lê  
 Navê te  
 di hemû  
 dilên paqij  
 de ye.  
 û li ser  
 hemû  
 zimana ye

Navê te  
 pîroz e  
 dema  
 tê gotin  
 hemû serî  
 xwe jê re  
 ditewînin.

Abdalhalim MALLAMOHAMED

## Xewna du bilbil û xalîçeyek

Receb DILDAR

Nizanim ev çî xewn e. Eman ji min biriye. Çî çax çavên min herin ser hev, tayêş xewî bi-bim, xewna berê dîsa dîsa dibînim. Edî ji tîrsa wê xewnê naxazim rakevim. Ji bo xewna xwe bidim şîrove kirin li dû pir mirovan geriyam. Tu kesan, ji bo ez ji wan bawer bikim, tiştê nêdan destên min. Piştî min wan guhdarî dikir, ez û êşa xwe dîsa li kêleka hev rûdiniştin û me bi hev re selawatên sebrê dikişandin. Ez li dû xewna xwe, wê rewşa , ne tu rewş, pir geriyam. Ne fal-baza Qoserê, ne nivîstên meleyan û ne jî şêxên Pasûrê ji xewna min re şîrovekî nedîtin. Xewna min bûbû bela serê min.

Çend roj berê, êşekê li ser dilê min peyda bûbû. Min xwe ji nav Çarşiya Şewitî, bera ser Çarşiya Mast a kevn da, çûm dikana Usibê Kor, ji bo dilê xwe hinek mervend û meyremxort send. Ez zû de neçûbûm hêla Minara Çarling, min got hey ez heta vira hatime, seriyek bidim wê hêlê jî. Min bala xwe dayê, sofîyekî rîsipî pala xwe daye lingekî minarê, kûr kûr diponije. Kalê rîsipî xewna min anî bîra min. Piştî silavekê, min jî li cem wî xwe da erdê. Me hinek li hev pîrsî, hinek rewşa dinyayê bir û anî, dawiyê min mijarê anî ser xewna xwe. Got "Hela hêdî hêdî ji min re bi-bêje, ez fêhm bikim. Di serê min de kul û derdê dinyayê pir derbas bûne. Di vî emrê dirêj de, min pir bûyer dîtin, bihîstin û min pir xewnan jî şîrove kirin. Dibe ku ji xewna te re jî çareyek bibînim."

Piştî gotinên kalê rîspî, min jî dest pê kir û xewna xwe jê re vegot; "Ez tim di eywaneke fi-reh de me. Li erda eywanekê xalîçeyê mezîna raxistîye. Xalîçe bi her rengî xemlandîye û pir xweşik e. Ez li ser vê xalîçeyê rûniştî me û rojên xwe dikim roj. Der û dora min tije gul û kulîl-kên reng bi reng in. Di nav gul û kulîlkan de cotek bilbil dixwînin. Mîrov naxwaze, ji vê salona xweş û mezîna derkeve. Mîrov dixwaze tim û tim li ser xalîça rengîn rûnîke, gul û kulîlkan bi bîn temaşe bike û her du bilbilên zîman şêrîn guhdarî bike. Belê xewn wî dest pê dike. Lê dawîya xewnê ew qas ne xweş e. Ji carekî de, di derî û şibakeyên eywanê re, hinek mahlûqat dikevin hundurê eywanê, her du bilbilên deng şêrîn dixin nava tûrikekî û wan dibin. Mahluqat dîsa vedigerin, îcar dest davêjin xalîçeyê, ji bin min dikişînin. Ez serpiştê li erdê dikevim, ew xalîçeyê dibin eywaneke din, ji xalîçeya xwe re dikin pîne. Ez dixwazim li dû her du bilbil û xalîçeya xwe bigîrîm, lê hêsr ji çavên min nayên. Bi tenê, matmayî, zoq li wan dinêrim."

Piştî gotinên min qediyam, kalo destê xwe avêt riyê xwe û hinek mizda, serê xwe hejand bir û anî, dawiyê berê xwe da min û got: "Kurê min ê bêaqil çima tu fam nakî. Her du bilbil zîmanê me ne. Yek Kurmançî, yek Dimilî ye. Xalîçe jî welatê me ye, ji dest dihere. De îcar bigirî, he-la hêsr ji çavên te tîn an na." ❖

## Rawestgeha Xewnerojkan

Dema ku ez di tenêbûna kêliya te de bûm,

Stembarê xewnên xemgînî bûm.

Dema ku ez mêvanê xaniyên tarî bûm,

Qendîla mejiyên tarî tu bûyî.

Dema ku ez lêgeranê xewneroşkên xwe,

yên windayî bûm

Di tebeqa afirînerê mirovên bê emsal

Ango di tebeqa te de xewneroşkên xwe didîtim.

Xewneroşkên min

Yên ku nizanim dê kengê bi ku derê de biçin,

Êdî ji te bi jêderkin...

Tu bûyî

Rawestgeha xewneroşkên min.

yên serberdayî...

Xewneroşkên min ên ku beriya te

Kesayetiya min nedikişand,

Piştî ku rê bi rawestgeha te xist

Rewşeke ku êdî kesayetiya min

Ew nedişikand girtibû...

Kanî ku carinan digotin

"qiloç ji guh derbas dibe"

beriya te xewneroşkên min

yên ku embazî 'qilç'ên biçûk bûn

û

Ji kesayetiya min a ku embazî

"guhên dirêj" re êdî

gorepan dixwend...

Di boriya min a dilsotîner de,

Xewneroşkên min

Ên ku bi zehmet tîn bîra min,

Êdî zîvirîbûn 'tov'ên gulistanan

Ên ku ji her alî ve ji te bêhn didan...

Qasim SERHEDÎ



## Tu yê kengê vegeerî?

Zozan KAYA

Êdî tu tunevî...

Li ser tûnebûnê pir gotin nayên afirandin. Lê bi çûyîna te re gotin bixwe afirîn. Te du tişt li pey xwe hiştibû; yek melodiya li ser gîtarê ya din jî tûnebûna te. Ez û tûnebûna te li benda te man. Melodiya gîtarê jî carinan bi me re hevaltî dikir. Wê çaxê pir kêfa min dihat, ji ber ku em bi te tişt dibûn. Tu dizanî hê carinan te dipirsîn, ez jî wekî ku min tu duh dîtibe dibersivînim pirsên wan. Kes pê nizane ku em li hêviya vegeera te ne.

Gelo tu yê kengê vegeerî?

Dibe ku ev pirs pirseke çewt be. Dibe ku dîtina me ya dawî çêbûye. Lê ez tişteki miraq dikim, gelo gava tu çûyî tişteki jî te ji min nebî, dîrok jî jan nade te? Te bêriya tişteki jî nekîr; ma şerê me, serhişkiya min, stranên me yî ku me bi hev re digotin, melodiya gîtarê, çi ku me bi hev re par ve kiribin...Min pîr bêriya te kiriye. A pîr min bêriya çi kiriye tu dizanî? Gotina navê te...Gelo navê min jî tê bîra te? Te tu carî bi dengê nizm gazî min nedikir. "Zozêê" digotî lê serhişkiya min digirt heta ku tu negota "Zozan" min li te nedinihêrt. Dibe ku te ji bîr kiribe, ji ber ku te pîr tişt li pişt xwe hişte... gelek tişt. Ez carinan bibîranîn bi te re xeber didim, pîrsa li min dikin; lê mixabin ez nikarim bibersivînim. Ezman te dipirse, erd te dipirse, pirtûk û melodiyê ku te li gîtarê dixistî te dipirsîn û tûnebûna te dixwaze ji te xatir bixwaze, dipirse ji min.

"Gelo ewê kengê vegeere?"

Piştî çûyîna te pîr tişt neguherîn di jiyana min de. Hê jî nahêlim kesek ji min re bêje Zozê, hê jî serhişk û bê pejn im. Lê tu baş nayê bîra min, ez te miraq dikim; rûyê te, bejna te, qama te gelo guherîne? Tenê çavên te têne bîra min, tiştên din giş paqij bûne di mêjiyê min de. Tîrêja çavên te têne bîra min carinan. Gotinên min ronî dike tîrêja çavê te, hêviyên min pirtir dike. Ez ditirsim ku rojekê çavê te jî wînda bikim.

Bîranînen te yeko yeko wînda dibin. Wekî te, bê xatirxwestin digirin serê xwe û diçin, ber bi azad bûnê ve. Mêjiyê min ji pirsên bîranînen te tevlihev dibe. Ê ku bersiv nagrin min tenê dihêlin û diçin. Kîjan diçe ez piçek din jî tazî dimînim. Ez û bîranîn te bi hev re ji te bipirsîn. Dibe ku em dengê xwe bigihînin te.

"Tu yê kengê vegeerî canê min" ♦

## Tenêti

dîsa li rêzika mame

li ber şewla findê

ser masê

di hembêza demsala hilcîrifî de mame

tenê, tip û tenê

di bin çavan de bûm

aniha girtiyek sizagiran

di girtîgeha çavên te de me

bijangên te li canê min jan digerin

lêvên te piyanoyê şevê ne

lê Bach radibe...

ma çi dibe!

canê min î biçûk bide nav zerbistanên xwe û bişidîne!

Nihat ÇELİK

## Bi Felsefe û Jiyana Xwe Melayê Cizîrî (1589-1664)

Şîraç AKTAŞ

Melayê Cizîrî, di sala 1589'an de li bajarê Cizîrê, bi navê "Ehmed" ji dayik bûye û li wir mezin bûye. Di wê demê de Cizîrî navenda zanîne ye. Gelek medreseyan kurdan ên namdar û tîkûz di Cizîrê de hebûne û gelek melayên bi nav û deng jî jê rabûne. Lê ji bilî Mela Ehmedê Cizîrî kesekî din bi navê "Melayê Cizîrî" nehatiye binavkirin.

Melayê Cizîrî bi bav û kalên xwe ve ji bajarê Cizîrê ye. Lewre di helbesteke xwe de wiha dibêje:

*Aşiqê nazik û mehbûban im  
Tu mebin bê ser û bê saman im  
Gulê Baxê Îremê Bohtan im  
Şeb çiraxê şebê Kurdistan im  
Çi tebiyet beşer û insan im  
Lî-lahil hemd çî alî şan im*

Wekî ku li jor jî hatibû zimên Mela li Ci-

zîrê ji dayik bûye û navê bavê wî Şêx Mihe-med e. Mirovekî zana û bala bûye. Melayê Cizîrî sey û perwerdehiya xwe ya pêşîn, di medreseya di dema xwe de namdar, di Medreseya Sor de, li nik bavê xwe pêk aniye. Ev medrese, di Cizîrê de, medreseya fermî ya namdar e û ya Dewleta Botan e. Li dû xwendina xwe ya li Cizîrê re li gejek herêmên kurdan, ereban û eceman geriyaye. Di gelek medreseyan tîvel de, xwendiyê û seydatî kiriye.

Demeke dirêj li bajarê Amedê jiyaye û di medreseya wir de seydatî kiriye. Paşî Mîrê Cizîrê ew aniye û heta dawiya jiyana xwe li Medresa Sor de maye.

Ji Melayê Cizîrî re; ji ber ku bavê wî şêxê tarîqetê bûye û navê Mela yê rastîn Ehmed bû, hinek jê re "Şex Ehmed an Şêx Ehmedê Cizîrî" jî dibêjin. Lê bi xwe ji xwe re "Şêx" an "Şêx Ehmed" negotiye. Ji bilî van

nav û nasnavan di hin nivîsên xwe de "Mela", "Mele", "Nişanî", "Melayî" û "Melayê" jî bi kar aniye. Lê bi piranî "Mela" an "Melayê Cizîrî" bi kar aniye.

Melayê Cizîrî, di nava gelê kurd û wêjenasên cihanê de gelek bi nav û deng e. Lewre di hemû çiqên wêjeyê de, gelek şehreza bûye û ew şehrezatî derbasî helbestên xwe kiriye. Mirov dikare bi hêsanî ji bo Mela bibêje; wî wêjeya kurdan tenê hilnedaye asteke bilind her wiha ya cihanê jî bi hunera xwe re hildaye... Di helbestên xwe de peyv û biwêj ew qas bi hostatî honandiye ku kêmasî nehiştiye; her wisa kêmasî cihbûn û tîkuziya mecaz, wezn û kafiye de jî naxuye. Ji bo vê yekê dibêjin; "Helbestvanên cihanê, hêsîrên wezn û kafiye ne, lê belê wezn û kafiye jî di destê Melayê Cizîrî de hêsîr in."

Der heqê jîna Mela de gelek tişt tene gotin. Lê mirov dikare li ser helbest û nivîsên wî hûr bibe û pir hindik bibe xwedî angaştekê. Ji bo vê yekê, gava ku mirov li hin helbestên wî dinihêre, xuya dibe ku Mela di kîjan demê de jiyaye.

Mela der barê Şêx Se'diyê Şîrazî ku di navbera 1213 - 1293'yan de li dinyayê bûye wiha dibêje:

*Me ra ji ewel çî bir xamî  
Kîşand axir û bi bednamî  
Ji rengê Se'dî û Camî  
Ji şuhret pê hesîn amî*

Dû re der heqê Hafîzê Şîrazî (1325 - 1389) de wiha dibêje:

*Ji Hafîz kutbê Şîrazî  
Mela fêhm er bike razî  
Bi awzê ney û sazî  
Bibî ber çerxe perwazî*

Dîsa Mela, ligel dabaşkirina hin navên din ên tene nasîn, ji dabaşkirina navê Mewlane Camî ku ji sala 1414'an heta 1492'yan jîna xwe domandiye jî paş ve nemaye. Ew helbesta ku navê Şêx Se'dî tê de hatiye gotin, Mewlane Camî jî di wir de bi vî awayî ye:

.....  
*"Ji rengê Se'dî û Camî"*  
.....

Ji van helbestan tene zanîn ku Melayê Cizîrî li dû van kesan li cihanê bûye; lewre di helbestên xwe de qala navên wan kiriye.

Piştî van helbestên ku di vê derê de derbas dibin jî, hin helbestên din jî henin ku "Mela û Mîr" tene dane ber hev û her wiha "Feqê û Mela" jî pêşberî hev gotinin. Feqiyê Teyran di helbesta xwe de ji Mela re wiha dibêje

*Birîndarê eşqê me  
Dûr im ji siha bihan  
Dizanim medahê kê me  
Di hezar û yek û sihan  
Senaxwanê Melê me  
Li hemû erd û cihan*

Ji vê helbesta Feqî jî tene zanîn ku Melayê Cizîrî heta 1031'ê koçî (1622 zayînî), zindî li cihanê bûye. Û bi vî awayî derdikeve holê ku Mela di navbera 1589 - 1664'an de jiyaye.

Melayê Cizîrî him bi ilmê xwe, him jî bi kesayetiya xwe kesekî pir mezin e. Ew qas zanaye ku; dikare bi şagirtê xwe re bikeve pêşbaziya helbestê da ku şagirtê xwe pêş ve bixe. Û di helbestên xwe de ew qas bi zanatî gotin li hev anîne, ku her mirovek ji xwe re wateyekê jê derdixe.

Di nivîsên wî de hostetîya wî derdikeve holê û bi her gotinekê ve wateyên kûr, lê li hev dertê. Li ser her helbesteke wî cur bi cur nîqaş hatine kirin. Li gor hinan di helbesta wî de yara Cizîrî Xwedê ye, li gor hinan resûl e, hinek dibêjin keça mîrekî ye û hinek jî dibêjin ku yara Mela welat e.

.....  
*Xema îşqê perêhtim ez,  
 Hebîba xemrevîn kanê,  
 Seraser têk behîtîm ez,  
 Ji derdê ferq û hîcranê*

*Firaqa dîlbera rind e  
 Bêhîtîm her wekî fînd e  
 Musulmanek di rê min de  
 Xeber bit ba li siltanê  
 Xeber bit bal şekerxayê  
 Şepal û xob û zîbayê  
 Ku mîr e belkê bîrê nayê  
 Esîrek wî di zindanê*

Hin kes jî li gor van helbestan dibêjin ku yara Mela keça Mîrê Heskîfê ye. Mîr lê hatiye xezebê, ne keçikê didê û ne jî hiştîye Mela di sînorê Heskîfê re derbas bibe.

Digel vê helbestê hinek dibêjin yara Mele ji malbata Mîrê Botan xatûneke pir bedew bûye û jê re "Xatûna Biskkesk" hatiye gotin. Û ewên vê yekê dibêjin jî xwe dispêrin van helbestên Mela û tînin li gorî xwe bi hev ve girê didin.

*Îro ji nû pir atêş im, dîsa ji remza dîlberê  
 Mecrohê qewsê pir xweş im, tîr dane nîva cîgerê*

Di helbesteke din de jî dibêje:

*Muhbetê mihnet di zor in  
 Huba dêm bê şik bela ye  
 Umr jî xweş pê diborin  
 Sotin û derd û cefa ye*

.....  
 Her wiha di nava gel de riwayeteke wanî jî digere:

Dibêjin ku, Melayê Cizîrî, diçû dehlê, li erdekî rûtal û teng li ser kevirekî rûdinişt. Ji bo diriskirina sewtê, bi dengê bilind helbestên xwe dixwend. Ji Finika Botan bi navê "Dawid" melayek jî her roj tê û xwe di nava dehlê de vedişart. Gava Melayê Cizîrî helbestên xwe dixwend Mele Dawid jî dinivîsand û dû re diçû medreseyê ji feqe û meleyan re digot; "Îro min ev helbest sazandîye." Û bi dilekî şewat û kovan dixwend. Melayê Cizîrî, bi vê yekê dihese. Dîsa wekî rojên din diçe, li ser kevir rûdine û bi dengê bilind vê helbestê dixwîne:

*"Ey mela namê te ye xemset eşer\*  
 Tu bi şî"ra ne te gotî xwe dikî qend û şeker  
 .....  
 Dirê nasuftê dihûnî me nedî mislê te qet  
 Ne di semtê Ecemê de ne di iqlîme Teter  
 .....  
 Tu dizaniy Finika te ne mekanê xezela ye  
 Çi buha têne metaî te ya bê ser û bê bin  
 .....*



.....  
*Ehmed im sînesîper pêşberî tîra felekê  
 de' wedarê te me îro tu ji dehlê were der."*

Piştî ku Cizîrî seydatiya Medresa Sor hildide destên xwe, nav û dengê wî zêdeyî berê li cîhanê belav dibe û kesên ku di wê medresê de dixwînin jî gelek jê ji wan bi nav û deng dibin. Wekî ku tê zanîn piraniya kesan piştî mirina xwe di nava gel de têne naskirin. Lê Melayê Cizîrî, di jîna xwe de, gihîşte vê astê. Sedema vê yekê jî wiha tê nişandan. Ku Mela ligel zanîna helbestan, wezna gelemperî û wezna arûzê, bi zanîna xwe ya şerîet, hedîs, tefsîr, rêziman, mentiq, felsefe, dîrok û teknîkê jî pêş ve çûbû.

Berhemên Melayê Cizîrî di "Dîwan"a wî de hatine bicihkirin. Mirov dikare helbestên wî bike du beş; helbestên evînî û yên tesewufî. Helbestên wî bi piranî evînî ne. Wekî hemû hozan, destannivîs, çîroknivîs û helbestvanên kurd evîna wî jî şax didin, rehên xwe bera binê erdê didin û ebedî dimînin. Evîna wî jî bi vî rengî ye.

Mamostê me yê hêja li bajarê Cizîrê koça xwe ya dawîn dike û gora wî li baxçeyê Medresa Sor, di guhişka başûr de digel gora şeş mîrekên Cizîrê hatiye çêkirin.

Mamostê nemir di dema jîna xwe de çawa namdar bû, hîna jî di nava gelê kurd de û her wiha di nava wêjenasên cîhanê de xwedî qiymet e. Û hîna jî Melayê Cizîrî pêşîya me ronî dike.

Ji ber vê yekê helbesta wî ya ku dil ji mirov dibe, me jî xwest ku di dawiyê de pêşkeşî xwendevanên xwe bikin...

## DIL JI MIN BIR

*Şoxê û şengê zuhre rengê,  
 Dil ji min bir, dil ji min bir,  
 Awurên heybet pilingê,  
 Dil ji min bir, dil ji min.*

*Wê şepalê miskî xalî,  
 Dêm dorê gerdên şepalê,  
 Cehbeta biskan semalê,  
 Dil ji min bir, dil ji min.*

*Zulf û xalan nûn û dalan,  
 Wan ji min dil bir bi talan,  
 Goşeyê qewsê helelan,  
 Dil ji min bir, dil ji min.*

*Dêm nedîrê bo enbîrê,  
 Xemrî û gîso herîrî,  
 Sîne kir armancê tîrê,  
 Dil ji min bir, dil ji min.*

*Sor şîrînî nazenînî,  
 Kuştîm û nakit yeqînî,  
 Wê bi çengela evînê,  
 Dil ji min bir, dil ji min.*

*Fîtil û taban da xuraban,  
 Ebleq û cohtê şebaban,  
 Dame ber pence û kulaban,  
 Dil ji min bir, dil ji min.*

*Xoş xeramê, ez xulamê,  
 Nazikê, şîrîn kelamê,  
 Tutiya eyvan meqamê,  
 Dil ji min bir, dil ji min.*

..... ♦  
 Çavkanî: Sagniç, Feqî Huseyîn: Dîroka wêjeya kurdî r :375-386

## Darên zarok

em ketin meşa ronahiyê  
bizdiya mirin  
piştî çûyîna me  
deriyê bajarê çil caran li ser me hatin girtin  
bi qasî zayîna xezalekê bi xwezayî  
me qeşirand çermên tirsê ji zikê xwe  
em bûn şêrgele  
di qirika me de straneke hinavsotî  
û her dinaliya li ser zimanê me

beriya hemû kesan  
av vê jînê difikirî  
beriya hemû kesan  
ronahî difikirî ku ji xwe re rengan biafirîne  
ji bo ku di rojên xwe yê xemgîn de  
xwezayê bi rengan bineqşîne

kêşeke êş di berkêşa sînga xwe de  
me vedişart  
cixarên me di esmerbûna şevan de  
bi devên xwe yê agirî hevûdu maçî dikirin  
û her gava ku baran dibariya  
dibû çilkeke baranê gewdê me

ji xwebûna xwe direviyan em  
dîsa em vedigeriyan xwe  
me dilên xwe bi xwe dişewitand  
du milên di emrê me de  
em hambêz dikirin  
û gava me ji vî bajarî hez dikir  
darên wî zarok bûn  
mezin bûn kolan  
êdî me nikaribû hambêz bikira êvarên wî

Mem BAWER

## Jiyanên hepar

Amed Ç. JIYAN

"Were Soro! Baz bide, di vir de gencîneyek heye. Bang li Biro û Ūso jî bike...de bilezînin, bi tena serê xwe nikarim derxînim." Sado li sergoyê bajêr derketibû ser girekî ku ji qirş û bermahiyên mirovên wî bajarî hatibû pê û bi coş û dengê bilind bang li Ūso dikir. Gencîneya ku digot; tûrikeke nanê hişk bû. Ev tûrikê nê wê sê-çar rojan têra wan bikira. Ku hevalên wî tiştên din dîtibin hê xweştir dibû; tu pirsgerêk nedima.

Ūso û Soro bilez hatin cem wî; bêhna wan çikiyabû. Beyî bêhna xwe vedin alî wî kirin; tiştên li dora tûrik dane alî, Ūso û Soro bi seriyekî, Sado bi serê din girt. Gava tûrik hildan Sado ji Ūso pirs kir:

"Biro li kîjan quzilqurtê ma, dîsa bi hinekan re ketiye leqe leqê? Çima ew jî nehat?"

Ūso got:

"Biro li ber tûrikan ma."

Sado bi destê xwe Biro nîşan da û got:

"Wa ye li wir e."

Sado dîsa pirs kir:

"We tu tiştên baş dîtine?"

Soro got:

"Çend qonserweyên lorik, şoqil û masiyan." Sado bi vê kêfxweş bû, kêfxweşiya wî ji rûyê wî dihat xwendin.

Gava hatin ba Biro her sê jî westiyayî bûn. Tûrik ew çend ne giran bû, lê keysa wî nexweş bû. Biro bi çavên zeliqî pirs kir:

"Di tûrik de çi heye?"

Sado wekî nêçîrvanekî ku pezkoviyek girtiye, bitir û ji xwe qayîl got:

"Tûrik bi nê tije ye. Ev nan wê sê-çar rojan têra me bike." Qasekê bêdeng ma, tev li benda gotina wî bûn. Gotina xwe domand, "Çar roj betalî wê xweş be. De tûrikan hilgirin û em herin." Tûrik hilgirtin û ji bo herin malê ketin rê. Mala wan xaniyekî wêran

bû, xaniyê wêran ji sûka bajêr dûr bû. Ji ber ku bi şev mirov zêde tune bûn, ew der bêdeng bû. Her çiqas ji daristana jêr bi şev teqîn dihatin jî hê li van deran tiştêkî wisa neqewimîbû; ev der ewle bû.

Dema gihîştin mal, Sado hê jî diaxivî. Soro bi dengêkî tîreş got:

"De hiş be lo! Te ser û guh ji me bir." Ev gotin li qûna sado ket, lê eşkere nekir û bi rûkenî got:

"Lawo ma ne wisa ye? Emê çar rojan betal bin, di vî bajarê belqitî de wê bihosteke ax ji ber me nefilite," devê wî ji kêfan vezeliya bû. Ji dil û can dom kir, "Emê herin pe-ravê jî, emê bikevin behrê, heta çavên me ji hêlînên xwe derên emê li jinên qûntazî jî binêrin."

Biro kenîya û got:

"Me derdê te fêhm kir, hişê te ne li serê te ye, di serê k... te de ye." Tev bi vê gotina Biro kenîyan. Êso tûrikên xwe ji piştê xwe danîn erdê, deriyê depê yê jihevdeketî kaş kir û sipart dîwêr. Tev ketin hundir, ew î tûrikên xwe xistin hundir û derî dîsa danîn ber.

Sado, qotiya ku peywira sobe û lempê dianî cih bi texte, rojnamên kevin û bi kincên çiriyayî tije kir û ji bin ve agir pê xist. Tev li dora qotiyê civiyan, li ser doşekên peritû rûniştin û tiştên xwe yên ku îro berhev kiribûn vekirin. Şîva xwe jê xwarin. Tiştên ji ber wan man jî dîsa xistin tûrikan û tûrikan baş dadan. Soro û Biro tûrik birin danî quncika ku wekî mîngê bi kar dianîn û vejeriyan cihên xwe. Sado çar qotikên cixarê ji berîka xwe derxist, her yekî yek da wan. Qotikên xwe pêxistin, li ser doşekan xwe dirêj kirin û kincê çiriyayî ku wekî lihêfê bi kar dianîn bi ser xwe dakirin. Demeke dirêj bêdengiyek çêbû. Tev ketin ramanan.

Sado di bin çavan re li hevalên xwe nihêrt, tevan potik bi serê xwe ve kişandibûn. Ji ronahiya êgir rondikên Sado xuya dibûn, wekî stêrkên li ezmên dibiriqîn û ji çavan gêndir dibûn. Sado qotikeke din pêxist û yên man jî danî ber qotîkê. Bi milê xwe rondikên xwe paqij kir, berê xwe ji êgir da alî. Sê mijên kûr ji cixara xwe kişand. wekî zîlamên pîr quxequx pê girt, qam kir rûnişt, quxequxa wî danî. Mija dawî li cixarê xist, cixarê dakir nava qotîkê û xwe dîsa xwe dirêj kir.

Çavên wî giran bûbûn, lê xewa wî nedihat. Bêriya malê nedihîşt xew bikeve çavên wî. Şerên wî û xwişka wî Meyaser hatin hişê wî; wî li xwişka xwe dixist, xwişka wî digiriya û dûre diya wî dihat li ber serê wî barebar dikir, digot 'ezê ji bavê te re bibêjim, bila serê te biperçiqîne.' Dema êvarê bavê wî dihat, li dû gazinên diya wî bi henekî xwe hêrs dikir, dida ber dilê Meyaserê û ew li hev dianîn.

Bi dengê teqînekê Sado ji ciyê xwe pekiya. Wekî kundan serê xwe li dora xwe zîvirand, hevalên wî jî wekî wî rabûbûn ser xwe. Sado bi destê xwe binê dîwêr nîşanê hevalên xwe da, tev çûn binê dîwêr, piştê xwe bi dîwarê sar ve zeliqandin. Soro bi çavên xwe yê ku ji tîrsa fireh bûbûn li Sado dinihêrt. Sado xwe li erdê kaş kir û çû ba kulekê, di kulekê re li derve nihêrt. Du zîlam, bilez, bijor ve dibezîyan, di demeke kurt de jî di

tariyê de wînda bûn. Demeke dirêj bêdengiyek çêbû, hevalên wî ku ji sawa tîrsê dilêzîn, hatin cem wî. Çavên xwe li der û dora xênî gerandin, lê tiştêkî ku balkêş be bi ber çavên wan neket.

Ji dûr ve dengê alarma tirimbêlên polîsan hat, deng hêdî hêdî nêzîk dibû. Tev li nava çavên hev nihêrtin, dûre çavên tevan çû ser Sado. Pîrsa di çavan de Biro bilêv kir:

"Vêga wê polîs werin, emê çi bikin?"

Sado qasekê bêdeng ma, berê xwe da derve, dûre li hundir nihêrt û got:

"Rabin, divê em ji vir derkevin."

Êso kelegirî got:

"Emê herin kurê?"

Sado bihêrs rabû ser xwe û bi dengêkî tûj got:

"Ez jî ku zanim. De rabin em herin, polîs wê vêga li vir bin."

Rabûn û ji mala wêran derketin. Li ser rê qasekê sekinîn, nizanibûn bi kîjan alî ve herin. Deng her ku diçû nêzîktir dibû. Sado rast çû kete sikakekê, hevalên wî jî dan dû. Di sikakê de bilez dibezîyan. Deng vêga ew çend nêzîk bû ku xuya bû ji rê dihat. Sado li dû xwe nihêrt, riya xaniyê wêran di nava ronahiyeke sor û şîn de bû, polîsan dora malê girtibûn.

Gava kuçe xelas kirin, berê xwe dane jêr û leza xwe kêmkirin. Hilehil bi wan girtibû, bêhna wan çikiyabû. Êso êdî nema dikaribû bimeşe jî, xwe berda ser peyarêyê, li wir rûnişt. Hevalên wî jî çav lê kirin, tev li ser peyarêya sar rûniştin. Hê demeke kin rûniştibûn Sado rabû ser xwe û got:

"Rabin vêga wê werin vir jî."

Êso di xwe de hêz nedidît ku rabe ser xwe. Êso bi milê Sado girt û got:

"Hinekî din em bêhna xwe berdin, dûre emê qet nesekinin."

Biro kir ku tiştêkî bibêje, lê Sado ku li quncika sikakê dinêrt reviya û got:

"Birevin!"

Wan li jor nihêrt, ronahiyeke lempeya destan li ser dîwêr digeriya, ew jî reviyar. Xwediyê ronahiyê gava li qunc zîvirî ew dîtin û bang li wan kir:

"Rawestin!"

Bi vê qêrîna wî hevalên wî jî hatin cem wî. Dema çeyên xwe ber bi wan ve zivirandin. Çar caran li ser hev dengê hat:

"Teq, teq, teq, teq!"

Her çar li dû hev tera bûn erdê. Çavên her çaran vekirî man. Sado serê xwe zivirand li hevalên xwe nihêrt, destê xwe ber bi Soro ve dirêj kir, du dilop rondik li ser rûyê wî hebûn. Destê wî hê negihaştibûn Soro, ji xwe de ketin erdê. ❖

## hêza te

Xwêdaneke sar diherike ji eniya min  
Dengê min dernayê  
Giriyê min bi min tê  
Lê... Ew çavên te yên efsûnî  
Yên ji çîrokên nexwendî mane  
Helbestên keftî diweşînî  
Ser birîna min bêwext  
Dilê min stewr bûye  
Dilê min hêdî hêdî sar dibe  
Ji vî asîmanê bêsinor  
Ji van dîwarên qirêj  
Lê... ew çavên te yên xezalî  
Yên bi heft rengan dorpêç bûne  
Kulîlkên newrozî dibişkuvînin  
Li ser dilê min î beyar û bejî  
Hêviyên min qut dibin  
Dişikên...  
Derdora min rûyên derewîn  
Derdora min dengên bêbext  
Lê... ew çavên te yên xezalî  
Bi kilên di kildanka bêrîvanê  
hatine neqîşandin...  
Hêviyek koçber mizgînê dide  
Evîndarên di qefesa xwe de fetisî mane  
Ez vî bajarî dixapînim  
Ev bajar min dixapîne  
Min destê xwe jê şûştiye  
Jê direvim jê dûrdikevim  
Lê... ew çavên te yên çardehşevî  
Ronahiyê dibarîne  
Li ser vî bajarê ji xwe xeyidî  
Ew çavên te yên efsûnî  
Ew çavên te yên biharî  
Ew çavên te yên xezalî  
Hêdî hêdî...  
Min dikujin di bin barê nêrîna xwe de  
û  
Hêdî hêdî...  
Min diafirîne bi hêza nêrîna xwe

Nenas DILDA

## Tewafkirina te

Di hesreta tewafkirina te de me  
Ez bi hesreta wê rojê me  
Ezê kengî te tewaf bikim  
Belkî tu vê yekê bibêjî:  
'Ev gotin bi te nakevin,  
Ev gotinên kesên surgunkirî,  
Gotinên qaçaxan,  
Gotinên derketiyan e...'  
Na yên wan tenê nîn in  
Ez di hesreta tewafkirineke azad de me,  
Tewafkirineke bêtirs bêsaawa bêîmanan  
Tewafkirineke bi dilê xwe, ji dilê xwe,  
Bi hemû hezkirin, rêz û evîna xwe...

Evin RONÎ

## Der heqê Sobarto de

Ridwan FELAT

Ev pirtûk, di sala 1999'an de li Stenbolê ji nava weşanên "avesta" derketiye. Hawê ku di dawîya pirtûkê de tê xuyakirin, ev pirtûk, pirtûka Helîm Yûsiv a çaramîn e ku ji weşanên avesta derketiye. Pirtûkên wî yên ku ji vê weşanxaneyê derketine ev in: "Mirî Ranazên (çîrok-1996- Stenbol), Mêrê Avis (çîrok-1997- Stenbol), Jinên Qatên Bilind (çîrok-1998- Stenbol) û ya herî dawî jî Sobarto (roman-1999-Stenbol) ye.

"Sobarto: Li gorî jêderên dîrokî, sînore Sobarto ji rojhilat de Çiyayê Zagros e û ji rojava de jî Çemê Xabûr e. Li gorî Merdok Blan (710-721 B.Z.) Sobarto navê herêma Aşûriyane".

Piştê vê daxuyandinê bawer im ezê êdî dikaribim xwe li "Deriyê Yekemîn" biqelîbînim. Deriyê Yekem (Welatê serseriyan, welatê leqeban, navên çewt û axa hetîketiyî) dibê û dest bi romana xwe dike nivîskar Helîm Yûsiv. Nivîskar her carê me dibe ber deriyekî; lê li ser her deriyekî nêrînen wî hene. Dixwaze bi van nêrînan pêşiya me ronî bike. Bê xwendina wan nêrînan û rexneyan, tu kes nikare di wan deriyan re lingê xwe bavêje hundir. Dema em bi alîkariya nivîskar di vê labîrentê re derbas dibin, derî li ser derî vedibe li pêşiya me; lê dema ku em tene ber deriyê dawî, nivîskar xatir ji me dixwaze û me bi tena serê me dihêle. Lewre ev derî deriyê biryar girtinê ye: "Biryara xwe bide, tu yê çi bikî?" (di pey re ev pirs wê çêtir bê fêhm kirin, lê pêwîst e ez beriya wê hin tiştên din bibêjim.)

Beşa yekemîn (Deriyê Yekemîn), mîna encama pirtûkê ye. Em dikarin bêjin ev encam bi tevahî mîna filmekî ye û nivîskar ji dawiyê de dest bi filmê xwe kiriye. Lê belê encama vî filmî çî ye û ji me re çî dibêje? Ka em wê jî ji nivîskar hîn bibin:

Silêman " piştê xwe dabû dîwarê êşa kevnare, nema dikaribû xwe li ber dubarekirina wê xewnê bigirta. Mîna derziyan wêneyên xewnê di çavên wî de diçikiyan, ew xewn bi xwe ye (jineke spî...lingan hildide û ji nav herdû ranên ji hev çûyî petrol diherike.)

Silêman temaşekirina wê petrolê dikir. Dixwest ku vî welatî seranser di nav êgir de bişewtîne...

Bişewite Sobarto, mal bi mal bişewite! Ey qîza maran! Ey welatê teriyên dirêj û berovajî kolan bi kolan bila agirê kîna nava min li te bibare!.."

Piştî nifirên Silêman, şerîta film paş ve tê vekîşandin. Tiştên ku di serê Silêman re derbas bûne, malik bi malik tînen raxistin li ber çavên me: Şewata Sînemaya Amûdê, tîkiliyên sobariyan, tekoşîn, evîndara wî ya pê re ne rast Belqis, jina ku ji nava ranên wê petrol diherike, zarokatiya wî, heval û neyarên wî, bavê wî, cîranên wî...

Pirtûk bi gelemperî li ser jina ketî, dexesiya mirovan, tîkiliya kesên û dirûtiya kesên siyasetmedar, yên ku bi çî awayî siyasetê di rêya karên xwe yên qirêj de bikar tînin hatiye nivîsîn. Lê vana tev bi riya ponijandina Silêman tînen ziman...

Mirov dikare bibêje nivîskar ev roman li ser ponijandinên lehengê xwe yê yekemîn Silêman damezirandiye. Ji ber wê her ku Silêman dikeve nava xewnan, roman jî li wê gorê paş ve li ba dikeve û tiştên ku em nizanin li ber çavên me tînen raxistin...

Niha em li lehengên romanê binihêrin:

## II TÎPOLOJIIYA LEHENGËN ROMANÊ LEHENGËN YEKEMÎN

**SILÊMAN:** Roman li ser vî lehengî hatiye afirandin. Car caran xewnekê dibîne: "Jinek spî...lingan hildide... û nava her du ranên ji hev dûr çûyî petrol diherike." Ev xewn di romanê de -mirov dikare bibêje- tiştê herî ne diyar û balkêş e. Lewre tu kes nizane, ev jînek kî ye û çima ji nav ranên wê petrol diherike. Ev petrol çî petrol e ne diyar e...

Silêman evîndarê Belqis e, ku ew bi xwe lehengê romanê ye. Hevalê Mistoyê qop, Biskuvîto, Biro, Dîno...ye. Kurê Dawid e. Li Saborto xwendekarê dibistana dawîn, berdestê mele ye (an jî şêwr û mişewra wî bi mele re heye), li derveyî Sobarto zanîngehê dixwîne (beşa felsefê), lê kuta nake. Bi cinan re têkildar e. Bi balinde, ba, pepûk, zarokê ku ji ronahiyê çêbû ye, mirî û bi hwd. tiştan re têkiliya wî heye. Kesekî awarte ye. Bi zêdeyî sê kesan re têkiliya wî ya germ heye. Lê li wateya jiyane digere û ne bi aram e.

**2-BELQIS:** Di pey Silaman re, lehenga herî girîng Belqis e. Xwişka Biskuvîto, qîza mamoste Merwan û Xanim e, evîndara Silaman, jina Serzelût û qiralîça Koxa Pîra Felek e.


Kesayetiya wê rûneniştiye. Du gotinê wê li ber hev nayên; serê sibehan ji bo Silêman xwe diperitîne, danê nîvro-yê Silêman ji bîr dike û êvaran bi girî lêborîna xwe dixwaze. Piştî ku bi Serzelût re dizewice, tu wateya jiyana wê namîne. Her tiştê wê heye, lê ew li evîne û şabûnê digere. Ji ber ku Serzelût ji daxwazê wê re nikare bibe bersiv, ew jî bi kesên din re radikeve û radibe û fantazyên xwe derdixe meydanê. Di dawiya romanê de dikeve koxa Pîra Felek û jiyana Silêman serûbin dike.

### LEHENGËN DUYEM

**PÎRA FELEK:** Kes pê nizane kî ye, ji ku ye, kengê hatiye Sobarto. Mîna marekî ku kiras bavêje roj bi roj diguhere. Carinan tu mêze dikî pîreke hilhilandiye, carinan jî mîna keçeke hivdeh salî ye. Kes nizane ku çend salî ye; lê ye ku tê zanîn Pîra Felek sawek mezin xistiye dilê Sobariyan; her kes hivza xwe jê dike. Koxeke wê heye, kes newêre nêzî wê koxê bibe; lê di dawiya romanê de tê famkirin ku ew kox mîna kerxaneyekê ye û Pîra Felek li ser wê nivîsiye "Hûn bixêr hatin Sobarto"... Jinên ketû di vê koxê de di bin parastina Pîra Felek de ne.

**MISTOYÊ QOP:** Hevalê Silêman e, lê çend sala jê mezintir e. Zewiciye û du qîzên wî henin. Jina wî bi wî re nerast e; wî bi sûtalek Sobarî re dixapîne. Misto, rojek wan di ser hev de diqefêle. Jînek ji tîrsa, xwe ji şaneşînê davêje û dimire. Ji alîkî din ve jî Misto xwediyê mala Silêman e. Piştî mirina jina xwe, mala xwe dibe Sobarto...Şewirmendê Silêman e; lê ji rûyê Belqis de Silêman wî dike.

**BIRO Û DÎNO:** Herdu birane û hevalên Silêman ê zaroktiyê ne. Dîno, ji ber siyasetê çendekî di girtîgehê de dimîne. Biro jî di dema ku Dîno di girtîgehê de ye xwe dispêre vexwarinê û her tiştî "toz" dibîne. Cihan toz e, mase toz e, ew toz e... Lê li ser şewata Sobarto (ya duyemîn), Biro dev ji vexwarinê berdide û biryara derketina "çiyê" digire. Beriya derketinê li belavok û daxuyaniyên siyasî dinihêre û dibê: "Ezê bi ser van pelan de bimîzim, kanî kîjan gel li dinyayê bi pelan û hubrê tenê rizgar bûye". Serê xwe dihejîne û hin navên ji hev dûr dixwîne: "Sînema, Mazlûm Dogan, Zekiye Alkan, girtîgeh, Ronahî û dilê min..."



Guhertineke ecêb çêdibe. Dîno dibe Biro, Biro dibe Dîno. Dîno jiyane dişibîne tozê lê Biro (Qralê meyê) lêdixe diçe çiyê. Li gora min çawa dibe bila bibe guhertin di demeke ew qas kin de çênabe. Dibe ku Biro biguhere lê guheretina Dîno nayê fêhm kirin.

**BAVÊ EMŞO:** Xweha xwe difiroşe û ji piştta wê pere qezenc dike. Di dawiya romanê de dibe dergehvanê koxa Pîra Felek.

**SAVARÊ SERZILÛT:** Mêrê Belqis e, dewlemend e; lê di alî evîndariyê de Belqis wî kêmkê dibîne û wî mêr nahesibîne.

**MELE:** Temsîla olê ye. Olê, li gorî xwe dide nasîn. Bi dûrbînê li "proleterya" digere, da ku wî bibîne û pê re xazozekê vexwe.(!)

**MAMOSTE MERVAN Û XANIM:** Bav û diya Belqisê ne. Xanim, mamosteya Silêman a dibistana dawîn e. Ji wan re behsa "qapîtal" dike. Mêrê wê, siyasetmedar e, lê gotin û kirinên wan hev nagirin. Belqisê, ji bona ku Savar dewlemend e, didin wî. Nivîskar di kesayetiya wan de, qirêjbûnê û dirûtiya hinek siyasetmedaran aniye zimên.

**SILVA, FIRYAL, SELMA:** Silva û Firyal keçên biyan in û fileh in. Lê rewşa jiyana Sobarto nacbînin. Li gorî wan Rûs û Emerîqa çêtir e. Mirov li wan deran, ji vir azadtir e û ji wan jî girîngtir li wan deran ev gemarî tune ye. Selma xwişka Savar e. Dilê wê dikeve Silêman, lê ji ber ku Silêman rû nadê diçe. Belqisê ji Savar re dixwaze. Silêman bi herdu keçikan re razaye.

### III

Nivîskar di pela 114'an de pêşiya romanê dibîne û dibêje: " û tu... ey Helîm Yûsiv çî karê te pê ketiye? Tu çima dinivîsînî..." bi van gotina em fêhm dikin ku, nivîskar êdî hew debar kiriye. Dixwaze hin tiştên bînan dîtînin û ji ber vê dîtîne ku pêwîst bike pêşî li romanê bibire. Ez hestên nivîskar fêhm dikim, lê ev pêşbirîn berê jî hatibûn ceribandî. (di pirtûkên edebiyata cihanê de) lê ji ber ku baş nehat dîtînin (li ser paşaroja romanê) dev jê hat berdan. Ê baş ew e ku, hîs di bin peyvan de bi zimanek hunerî bê bikaranîn û ez bawer im nivîskar (em çend cihan jê derbixin) li ser vî tiştî ketiye.

Çi ne van tiştan?

1- Pêşî li romanê birîn.

2- Hevokeke zêde bê bikaranîn.

3- Lehengên duyem an jî leheng ku li hev bikevin.

4- Guhertina derûniya lehengan pêwîst e baş bê nîşandan, ger guhertin bê çêkirin jî lingek wê li hewa dimîne û ji baweriyê dûr dikeve.

5- Girîngiya dema encamkirina pirtûkê, ku dem nehatibe nayê bi encamkirin.

### IV

Deriyê heftemîn: Nivîskar di nava kevanekê de tu nêrîn neaniye zimên. Ji ber ku vî derî ew na, emê vekin, naxwaze tiştêkî bibêje. Lê em dizanin ev derî, deriyê biryar dayinê ye. Lê gelo ev biryar çî ye?

Tiştê ku min jê fêhm kir;

1- Ya hûnê di Sobarto de, di vê gemariyê de bijîn,

2- An jî hûnê biryara jîneke nû û azad bigirin û ji bona wê çî pêwîst dike hûnê bikin.

Di encamê de, ez dikarim bibêjim ku ev roman di warê kûrahiya derûnî de, yek ji romanên herî xurt ên bi kurdî hatiye nivîsandin e.

Pêwîst e bê xwendin. Ez bawer im ev roman di pêşerojê de wê bikeve nava klasîkên wêjeya kurdî.

.....  
\*Di destpêka Sobarto de hatiye nivîsîn ❖

## Ewrên tarî

ezê vebêjim, ewê fêm nekin reşdilan,

ezê vebêjim, ewê fêm nekin sernewqan,

êdî ez nikarim bigrîm,

bila edî ewr bigrîn!

ewrên reş û tarî...

wekî rewşa min a bê çareserî...

min got ku evîn, gotin reaksiyoneke kîmyewî...

min got ku azadî, gotin pîvaneke berjewendî...

min got ku aramî, gotin ka li ku derê ye...

xewna azadî, êşa evînê û fikaran...

di nav vê jiyana bêwate de,

tu bû rêgeha min a herî rast.

ey siltana qesra dilê min,

êdî nikarim ji bo te jî bigrîm,

bila edî ewr bigrîn!

ewrên reş û tarî...

Şerhad RÊNAS

## Malsewitî

Derwêgê LAL

Di ezmanê bêserûber de stêrk hêdî hêdî vedimirîn. Heyv mîna sêniyeke zîv di ezman de hatibû daleqandin; lê weke ku bi tîrsa tenêtîyê keve lez dida xwe, dûr ve diçû. Lacîwerdê ku ezman rapêça bû rengê xwe hêdîka vedikir. Rengê lacîwerd, bi destpêka şevê xwe li hawirdor gerandibû. Ligel destpêka şevê rengê her derê diguherî. Lacîwerda ezman û rengê erdê ku her celeb reng tê de heye bi hev şadibûn. Rengê şevê bêdengiyek bêhempa li xwezayê belav dikir; ji bilî dengê çem lawirên daristanan û sîsirkan... Çiya, gund û mirovên ku di nav de dijiyan; diketin hambêza tenêtîyê. Her tişt bêlebat dima, diket xewa şevê ku ji rengê lacîwerd pêk dihat.

Di destê sibê de lawir, çiya, mirov û hemû rengên jiyane bi hev re şiyar dibûn. Lawiran bi xewçûyîna stêrk û bi reva heyvê xwe amadeyê rengê rojê dikirin; şiyar dibûn. Mirovan jî bi dengê melle xwe amadeyê rengê rojê dikirin. Melle her roj di eynî wextê de mizgîniya rojê dida. Ji bo hinakan jî agahiya kambax.. Dîsa destê sibe de ji gundekî di nav çiyana de dengê melle bilind dibû. Êdî stêrk bi tiliyan dihatin jimartin û heyv jî winda bûbû. Lacîwerda ezman demên xwe yê dawiyê dijiya. Melle dawî li azana xwe di-anî; "esselatû xeyrun mînenn newm. Ellahû Ekber, Allahû Ekber..." Dû qedandina gazînerê ji malekî ku ji gund hinekî dûr bû, lambeyek veket. Mirovek misîn di dest de derket hewşê û ji bo ku destmêj bigire zendê xwe bada û got: Eûzûmîneşşeytanîrecîm...

Xaltiya Helîme weke her roj bi dengê melle şiyar bûbû û bi gotinên xwe yê ku tu car nediguherî destmêj digirt. Berê rojê ji xew şiyar bûbû lê hîn nehatibû ser xwe. Çavê xewê li ser bû. Dema ava cemidî li rûyê xwe kir laşê wê lerizî û bi lez destmêja xwe qedand. Ji bo ku zarok ji xew şiyar nebin derê hêwanê girt û çû oda razanê ku nimêj bike. Şalikê raxist û ji bo ku lingê wê tazî nemîne bi fanolîyê xwe lingê xwe pêça dest bi nimêjê kir.

Xaltiya Helîme dema diçû ser şalikê xwe di aramiyeke bêhempa de hîs dikir. Giranbûna laşê wê diçû. Dibû mîna çûkekî, ger perên wê hebûya wê bifiriya. Weke di pirtûka pîroz de dihat gotin li ser nimêjê li hember Yezdanê dilovan bi tena serê xwe bûn. Ji ber vê tenêtîya ku tenê bi yezdan re parve dikir, pir bextewar bû. Te digot qey bi hevê yê xwe re hestên xwe parve dike. Her tim tizbiya wê di dest de bû û navê Yezdan ji devê wê kêmbû nedibû. Lê ev çend roj bû kambaxiyek niqûf bû dilê wê. Jiyana wê ji nişka ve guherî bû û ligel dia yên wê, yên ku dû nimêjê re dikir guherî bû. Berê guhertina vê jiyane dia yên wê li ser axretê bû: "Ya rebb! Tu me ji agirê dojhê dûr bixî. Ya rebb! Tu me star bikî, rehmeta xwe li ser me kêmbû. Ya rebb!..." Lê êdî ji bo dinya derewîn dia dikir. Tizbiya wê dîsa ji dest nediket lê gotinên wê guherîbûn. Carina li ber tavrojka dîwar ji xwe ve diçû û di ber xwe de digot: "Pêşî dar û berê me şewitandin, dû re jî erdê me talan kirin niha jî dikin me bi qewirînin. Dojeh di dilê me de bi cih kirin. Ey Yezdanê dilovan! Tu agirê dilê min bitefînî. Kî sedema vê şewatêye ya rebb?! Tu wan jî tê de bişewitîn!"

Rewş her diçû xerab dibû. Agirê dilê wê geş dibû û laşê wê diheland. Di demek kurt de lawaz bûbû. Carina ji ber vê êşê xew nedigirt. Bi dilekî ne rihet jiyana xwe dom dikir û heta vê nerihetiyê bandor li nimêjê jî dikir. Di nimêjê de jî dişewat bû. Ji destpêka hestên qambaxiyê û vir de dema dest bi nimêjê dikir tiştên din dihatin hişê wê û nîskokê nimêjê nedibû. Ji ber vê jî ditirsiya ku Yezdan jê bixeyde. Lewra demek dirêjbû wê rewşê dom dikir û nikarîbû xwe ji vê rewşê bifilitanda. Carina xwe mîna sêwiyekê didît, ji ber ku qilqaliya dinyayê her diçû jiyana wê de cih digirt û ji axreta xwe dima. Êdî xwe mîna xerîbekî hîs dikir. Te digot qey Yezdan, wê ber bi cihekî biyanî şandiye.

Dû nimêjê re Xaltiya Helîme destê xwe vekir û serê xwe ber bi ezman de kir. Weke ku Yezdan li jor be. Êdî ji nimêjê pirtir nîskokê wê wextê dibû. Ji tîrsa ku zarokên wê ji xew rabe bêdeng dilê xwe ji Yezdan re vekir; ji ber ku Yezdan tiştên veşartî û hestên bêdeng jî didît û dibihîst. Bi tenê lêvên xwe lebitand û got:



"Ey Yezdanê dilovan! Van dilkevîran dîkin me ji warê me bikin, dibêjin ji bo stariya we divê hûn ji gunde xwe bar bikin. Ma kî dikare li cihêkî biyanî xwe star bike? Ne nas û ne jî heval heye ku em xwe lê xweş bikin? Min keda xwe li axa xwe reşand. Ez her derê gundê xwe bi keda xwe nas dikim. Lê li cihêkî biyanî?... Ma qey nabînin vaye porê min spiye; bûye weke hirî. Min digot qey xelata pîrbûnê çûyîna axretê ye. Lê awa xuya ye ku ew para me nakeve. Dêlva ku ez herimê dojhê cih guherandî û di warê me de cih girtiye. Emê herin û dû me de ewê kevîr li ser kevîr nehêlin, ewê talan bikin, bişewitînin. Ey Yezdanê dilovan! Rû li me bane de, kêfa van mirovên çavbirçî ku di çavên wan de xuya ye xwînxwarin, bi me neyîne. Tu mezinî! Her tiştî dibîni û dibihîsi! Tu mihrîbanî! Tu dilovanî! Tu..." Li hemberê Yezdan bi rewşeke ji xwe çûyî bêdeng diramiya. Bi dengê mêrê xwe bi xwe hat. Mêrê wê ji ber ku çûbû hecê, nav li xwe zide kiribû. Navê wî bû bû Hecî Ûsif. Xaltiya Helîme berî mêrê xwe rabûbû nimêjê. Lê ji ber ku pir diramiya mabû dawiyê. Hecî Ûsif rewşa jina xwe ditîbû û ji bo ku wê ji ramanan dûr bixe, di alî din de jî ji ber derengiya wextê got:

-De dirêj neke, roj hilat. Rabe şorba zarokan bide ser agir û tûrê şivan têr bike; wextê pez herin çolê.

Roj hilhatibû û her der ji tenêtiya xwe qetiyabû. Hawirdor di şenahiyeke cuda de bû. Hema her cih heta ku çavan didît, her tişt dilebitî. Xweza di dilanek xwezayî de bû. Bayekî nermokî difikiya û çûk jî bi dengê xwe jê re dibûn melodî. Orîn bi newala diket; bi dengê lawirên çêreşwar. Ji bilî gundê ku ji axa sor çêbûbû her der bi rengê kesk hatibû nixumandin. Ew rengê kesk ê bêdawîn jî bi rengê beybûnan, gulsoran, qerenfîl û sosinan hatibû nexşkirin. Û bi rengê reş... Belê, ew reng jî ji gund dihat. Di nav xwezaya bi rengên cur bi cur de tenê gund reş xuya dikir. Reş jî di nav xwezaya rengîn de li gor xwe di dilanekê de bû. Reşî di dilanekê reş de bû û bextreşan serî digirt. Gundî tev bextreş bûn; di wê dilanê de bûn. Kesek li paş nedima, her kesî pêşî dikişand. Ji zarokan bigire heta pîran...lê herî bi ser zarokan de diweşiya ew bextreşiya bêbav. Ew giyanên nûgihîştî li ber derbên bextreşiyê bêçare bûn.

Zarokên gund, zarokên demên malkambax bûn. Dema bêxwedî di ser van de zû diherikî. Zû dibûn zarok û zû pîr dibûn. Xwediyê wextê tûne bû. Lê te digot qey ji bilî wan her kes xwediyê wextê ye; ji bo xwe dem dîl xistine û ji bo wan jî diherikînin. Ji wan zarokên demên malkambax, ji wan zarokên zû gihiştî du heb li ber derê hewşa Xaltiya Helîme bi kevîran malik dilîstin. Ew zarokên Xaltiya Helîmê Kemo û Elî bûn. Xaltiya Helîmê ji wan re qala kambaxiya ku di dilê wê de geş dibû nekiribû. Nedixwest zarokên wê bi vê koçberiyê bihesin. Lewra gava ku leşker ji bo agahiya koçberiyê hatibûn gund Kemo û Elî pir tirsiyabûn û bi zêft dawa diya xwe girtibûn. Çekên leşkeran ên serî bi kêr wan bizdandibû. Bêyî ku hay ji mal xirabiya nêz hebin bi kevîrên bextreşiyê ji xwe re xanî çêdikirin. Ji bilî mala bavê dixwestin maleke wan, maleke ku bêhna zaroktiyê jê dihat hebe. Ji bo çêkirina malikê ji der û dora xwe kevîr berhev kiribûn. Wan nizanî bû ku kevîrê bextreşiyê li ser hev namînin. Bêyî ku haya wan ji tiştêkî hebe bi çêkirina mala xwe mijûl dibûn.

Her dû zarokan jî malên xwe, ji erdê bi qasî sê-çar bihosta bilind kiribûn. Mala Kemo ji ya Elî him fireh û him jî bilindtir bû. Ji ber ku mezin çêkiribû kevîrên wî zû qediyabûn. Ji xwe acizbûyî li dora xwe mêze dikir. Bi xwe re nedidît ku kevîran berhev bike. Çav li kevîrên hevalê xwe pîs kir û bêyî ku cîranê wî bibîne kevîrê wî girt. Carek, du car, sê car...lê Elî carek li dora xwe nêrî, dît ku kevîrên wî li ber qedandinê ye. Di dest de kir qîrîn:

-Dizzek! Tu kevîrê min didizî.

-Na lo; çima min diziyê? Te kevîrê xwe qedandiyê îcar tu dikî yê min bigirî.

-Ez kevîrê xwe nas dikim. Hah! Vana yê min e.

Kemo hêrs bû û destê Elî tan da û got:

-De wê da derewçîn. Elî hinekî şûn de çû û dest bi girî kir û berê xwe da mala mezin. Hîna di hewşê de bû dengê Xaltiya Helîme bilind bû:

-Çi ye kuro? Dîsa çî bû bi we? Stûyê we bişkê! Hûn çî ji hev dixwazin? Elî bi îske îsk dest bi gilî kir:

-Dayê Kemo kevîrê min dizî, got bi çavên şil.

Lê Kemo ji bo ku peyv lê zêde neyê gotin dabû dû Elî û peyva wî di dev de hişt:

-Na dayê. Elî derewa dike. Jixwe mizir e, ji ber ku mala min mezine zora wî dere.

Kemo nedixwest gotin were ser, lê Elî birîna wî derkiribû lewma pir hêrs bûbû. Lê hêrsa Xaltiya Helîme zêdetir bû:

-Hişin! Mîna kûçika ne ewtin. Qey derd û halê min ne besî min e; îcar ezê berbayê we kevîm!? De zû bazdin derve, got û bi ser zarokan de çû. Her dû zarokan jî lez dan xwe ku zû ji hêwanê derkevin. Lê di deriyê hêwanê de carek dîtîn ku li erdê ne. Zarokan şaşmayî li derve mêze dikirin. Lewra li alî derve jî cîrana wan ku jê re digotin Meta Sadê, li erdê bû. Dema bazda bûn derve di derî de tûşî hev bûbûn. Xaltiya Helîmê bi bazdan ser zarokên xwe re gav kir û çû bi milê Meta Sadê girt û wê ji erdê rakir. Xaltiya Helîme îcar bêtir dengê xwe bilind kir; kir qîrîn: "Wey lanet li we bê! Hûn dibînin we çikîr? Ezê we bikim xulamê wê. Wey mala min bişewite?! Hûn dibînin... Kûçikno! Kerno! Ma hûn li ber xwe mêze nakin. De zû tasek av bînin. Feqîrê tu dibîni ji tîrsa rûyê wê zer bûye.

Xaltiya Helîme ket milê cîrana xwe, wê bir hundir û li ser mînderê da rûniştandin. Meta Sadê dikira tişteke bigota lê peyv di devê wê de li hev diketin, tişteke jê nedihat fêhm kirin. Xaltiya Helîme hinekî bi tîrs got:

-Çi bû bi te Sadê? Tu bizdiyayî; netirse tişteke tune ye. Meta Sadê ava ku Kemo anîbû vexwar û bêhneke kûr kişand û got:

-Xwedê ji te razî be Helîme, hinek bisekine bêhna xwe bigirim. Meta Sadê bi bizdokî û bi rûyek zerok serî di berda diramiya. Lê Xaltiya Helîme peyv didomand:

-Te ez tirsandim xwişkê. Min go qey tiştêkî bi te hat.

Hîn peyva Xaltiya Helîme neqediya bû îsk e îsk bi Meta Sadê ket û bi girî got:

-Xwehê mala me dişewitînin, xwehê! Tu ketiyê hundir haya te ji tiştêkî nîn e. Carek rabe li paş mala xwe, li banê xanî binêre. Her der tije leşker bûye. Emê çî bikin? ....Meta Sadê gazinê xwe rêz dikir. Lê Xaltiya Helîme bi bihîstina peyva banê xanî û malê, xwe li derve dîtibû.

Ji ber ku mala Xaltiya Helîme ji gund dûr bû leşker dereng hatibûn mala wan. Kemo û Elî bi listika malika ji xwe çûbûn û ew jî ji xwe re li hundir di karê malê de dişixulî. Haya wê ji dora wê tune bû.

Xaltiya Helîme bi derketina derve re li banê xanî mêze kir; dît ku du leşker li ser banê xanî ne. Ji bo ku li rewşa gund binêre ji hewşê derket, bi gupegupa dil û heyirî li gund nêrî, mat mabû. Lewra ew keska-hiya ku xweza rapêça bû û bêhna mirova mîna bêdawiya xwe fireh dikir, qirêj bûbû. Qirêjî li ser kincên mirovan û li keska-hiya "xwezayê" lekeyên reş weşandibû. Heta ku lûleyên reş û dirêj xistibû destên mirovan. Ser û çavên wan jî reş bûbû. Ger ji dest, mil, pî û ji zimanê wan ê dibistanî nebûya mirovê bigota vana la-sayî mirova dîkin. Lê na! Ev ne lasayî bûn. Reşiyê, bextreşiya xwe diweşand û êdî cih ji xwe re fireh dikir. Heta ku gihiştibû ser û çavên mirovan jî. Weke her rengî di palasa xwezayê ya kesk de reşiyê jî pêşî dikişand û navnîşan jî îcar ev gund bû. Dilana bextreşiyê şên dibû.

Xaltiya Helîme bi gazin, nifir û bextreşiya xwe veşeriyê hundir. Li hundir Meta Sadê ji xwe çûyî hîn jî digiriya:

-Rabe ser linga ev çî halê te ye. Ewê mîna her caran veşerin, got Xaltiya Helîmê û li dora xwe mêze kir û dom kir:

-Ka zaro ku de çûn?

Bi rastî Xaltiya Helîme jî bi gotina xwe bawer nedikir. Hêvî dikir ku gotinên wê rast derkevin. Tîrsa ku nedihîşt nîskokê nimêjê bibe, di serê wê de hatibû. Û hêvî?... Her diçû jê dûr diket. Û bêkes?... Li kolanê gund textê xwe yê reş li dar dixist. Û tenêt?...Li gund her mirov tenêtiyek bû. Û hawar?...Her hawar daxwazek bû. Her hawar qîrîna tenêtiyê bû: "Ey Yezdanê tenê! Çareyek ji tenêtiya min re." Hawar li ser hawarê ye. Ey Yezdanê tenê!... Ey yezdanê dilovan!..."Gelo tenêtiyek dikare ji tenêtiyek din agahdar bibe?"

Xaltiya Helîmê bi dû zarokan ket. Lê hîn li derê hewşê bû leşkerek weke ku manga bi mozêkeve bi bazdan ser wê ve hat. Xaltiya Helîme xwe paş ve da. Dû re di keys kî de, bi demek ku qasî niçiqandina çavan hewş tije bûbû. Ew hewşa ku her tim jê dengê zarokan, miyan, mirîşkan dihat êdî bi dengê çekên leşkeran dilebitî: Teq...Teq...Teq...Berê lûleyan li hewayê, ezman diçirand. Û ji qelişa ezman tîrs dirijiya...Xaltiya Helîme piştî wê li dîwar, devê wê ji hev, bi dilê xwe yê ku mîna pêlên li qeraxan bikeve, matmayî sekinî bû. Sêwîtiya dil dikira ji devê wê bihata der, lê lalî bi ser her tiştî diket. Tenêtiyek lal wê dorpeç kiribû. Tenêtiya ku di bin siya lûleyan de mezin dibû wê bizdandibû. Dikira tişteke bigota lê dengê wê fetisibû ji ber wê tişteke jê nedihat fêhm kirin. Li dora xwe mêze kir. Li tiştêkî digeriya. Hişê wê hêdî hêdî dihat serê wê. Den-

gê lûleyên reş wê bizdandibû. Çavê wê him li deriyê hewşê him jî li deriyê malê bû. Guhê wê hêdî hêdî vedibû. Deng dihat ji hundir û ji derveyê hewşê. Leşkerekî dikir qîrîn; lê hew peyva "ermenî" fêm kir. Hat bîra wê ku Meta Sadê li hundire û leşkerekî jê re çêr dikir. Ligel dengê leşkerekî, dengê firaqa dihat. Xuya bû li hundir tişt li ser tişt nedihîştin. Dengê leşkeran û dengê firaqan tevlihev dihat. Ji nişka ve leşkerek tifinga wî di dest de, paşveki ji hundir derket. Dû re jî Meta Sadê xuya bû. Leşker bi tifinga xwe ya serî bi kêr, Meta Sadê ber bi Xaltiya Helîme tan da. Meta Sadê çawa Xaltiya Helîme dît, bi rev xwe avêt ser. Her dû jî ketin çongan û dest bi girî kirin. Zimanê Xaltiya Helîme êdî vebûbû lê ne ji gotinan re. Ji girî re vebûbû. Ji gotinên dil re... Ji bilî wan û hevrê yê tenêtiya wan tu kesî ji wan gotinan fêm nedikir. Bi zimanê tenêtiyê dipeyivîn, dikirin hawar û qîrîn. Lê deng nedîçû tu kesî. Te digot qey ji bilî wan tu kes, tu carî rastî vî zimani nehatiye. Girî li ser girî ...Qîrîn û hawar li ser hev û çêr li ser çêrê:

-Ermenî...xayin...kafir...

Hawirdor bi leşkeran hatibû dorpêç kirin. Dengê mirovan hatibû birîn. Qîrîn û hawar û teqîna tifingan dengê mirovatiyê dil girti bû. Li her derê rûreşî dilebitî. Lê di carekê de leşkerên ku di hewşa Xaltiya Helîme de bûn, di cihê xwe de mîna singê kutayî hişk sekinîn. Xaltiya Helîme ecêbmayî û bi tirs li dora xwe mêze kir. Gelo ev ji xêrê re bû an jî? .... Lê dîmena ku dît wê zêdetir bêhêvî hişt. Lewra zabitek ku li ser rûyê wî reng tune bû û xuyabû ku desthilatdar e ferman dibarand. Li ser milên wî jî îşaretên pozbilindiyê hebûn. Li dora xwe hêrs dibarand û ji wan re çêr dikir. Xaltiya Helîme sermiyandariya wî ji rûyê wî yê rûtiş ku ne hewceyê rengê reş bû, fêm kir. Desthilatdar îşaret da leşkeran ku berê tifingên wan li Xaltiya Helîme û li Meta Sadê bin. Bi pihînen hişk her dû jî erdê rakirin û birin derve. Desthilatdar îşaretek din da leşkeran û li ereba xwe siwar bû û çû aliyê gund.

Xaltiya Helîme û Meta Sadê, bi axîn û girî di nav leşkeran de ber bi erebekî reş diçûn. Xaltiya Helîme dema gihîş erebê dît ku herdu lawên wê tê de rûniştî, destê wan li ser çavên wan bi mistdan û bi îşk e îşk digiryan. Xaltiya Helîme mîna dîna xwe avêt ser erebê. Lê leşkeran bi hêrs her dû jî tan dan. Di qorziya erebê de dan rûniştandin. Lê êdî ne Xaltiya Helîme û ne jî Meta Sadê tu tişt li ser xwe nedigirtin. Ma hîn tişteki wînda bibûya mabû? Xaltiya Helîme herdu zarokên xwe hambêz kir, serê wan maç kir û da sînga xwe û got:

-Netirse ez bi qurban! Heyran, vaye ez li virim ezbeniyê min. Mala min bişewite; ez bi qurbana we! Ev çi bû Sadê di serê me de hat? Ev çi tofan bû?... Meta Sadê lepek mabû, ji miriyan bêtir kavi bûbû. Lê hîn jî ber xwe dida. Xaltiya Helîme dilorand. Bi rêketina erebê tevî leşkeran şemitîn kelekî. Bi şemitandinê hinek bi xwe hat, dîsa serê zarokan maç kir û serê xwe bilind kir û li hawirdor mêze kir. Dev ji girî berda. Îcar difikirî. Hecî Ûsif û lawê xwe yê şivan difikirî. Gelo tişteker serê wan de qewimî bû? Li ku derê bûn? Hîn bandora girî ji ser ne çûbû. Bivilê wê dikir fişefiş. Bivilê xwe xurand. Lê na bivilê wê ji tişteker din dixuriya. Tişteker din tevî hêsiran dibû û bi ser poz de dirijiya. Bêhnek tûj?.. Belê belê behna şewatê dihat. Xaltiya Helîme mîna dîna rabû ser xwe. Lê leşkeran dîsa wê da rûniştandin. Lê cih nedigirt. Di cihê xwe de serê xwe virde wîrda dibir ku alî derve bibîne. Lê pir nebihurî erebe vegeziya riya xwe rast kir û di ber malê de bi lez derbas bû. Li derve dîmena sor û reş li hev ketibû. Xaltiya Helîme çawa çavê wê li perçîna ku êdî bi pêtên agir sor dikir ket; mîna ku bi cîna bi keve hişk rabû ser xwe. Lê gumîniyek ku guh ker dikir ji erebê hat. Di keys kê de gumîniyêke din...Xaltiya Helîme bi rabûna xwe ya hişk pêşî serê xwe li hesinê erebê xistibû û dû re jî ketina erdê... Meta Sadê xwe avêt ser; bi qîrîn û tirs li rûyê wê dixist:

- Helîme! Helîme rabe ser xwe!

- Haho! Helîme çû...

Zarok diqirîyan û bang dikirin:

- Dayê rabe! Dayê rabe!

- Dayê...!

Lê Helîme ranedibû. Çavê wê vekirî peyva xwe ya dawî nivî hiştibû:

-Mal....

Yezdanê mihriban ji nav diayên ku jiyana wê ji diayan pêk dihat, bi tenê diaya dawî pêjrandibû:

"Mal şewitî!..." ❖

## ku şiyar nebe şiyarî

pixînen bêxemiyê fewitîn

ji bircên heyvên çûyî

û nixumîn mirin

ji çavên sersariyê

tiroletiyek bê fam serî li min gerand

ji bawêşandinên payizan

tarûmar bû porên hezkirinên xelekî

li daristana taristaniyê ...

berbûwên berbanga sor reqisîn

ji helkehelka şevqesasên dizek

li şevreşkên çavên min likumîm

pêçiyên qîz û xortên hinekirî

û

mêrkujan rimên xwe vedişartin

rolinîvro

di niqrikên laşên

bêxemiyê de ...

heger ku şiyar nebe şiyarî

û desta navêjiyê

neke kefa destên zipîziwa

kerbandinên xwêdana

wê bi pey xelkê keve rondikên bêdengiyê

qîm nake gilî û gazinên reşgirêdanê

wê here heyfa bavê

reşeka şara serê dê

wê bixeyidin gulê berbiro

ji rojê

û stêrk wê bicemidin

li çavên bê ...

Şerkeft BOTAN

## Dilapên Pênûsa Min

Azad JIYAN

Pênûsa min de binivîse, bipijîqe, hibra di hundirê xwe de bipirçîne. Rûyê rûreşan bilewitî-ne da ku fihêt bikin, ser xwe ve werin. Xwe nas bikin. Bizanibin ka ji bo çi ye ev rûreşî. Ew qas bextegenî û dilxemgînî ne bêwate ye. Laşê min diricife li ber vê xemsariyê. Ez dihêlim ji ber vê bêzarbûna kesên xwe nenas û di dilê xwe de dibêjim; êdî bes e! bes e ser nizmkin. Bes e bêçaretî. Êdî em ne bêçare ne. Çare pir in. Tenê xwenaskirin, jixwe bawerî û hêvîdarî têra me dike. Divê em bizanibin ka hêza me çiqas e. Bawer bikî ew hêza li cem me heye, di destê hinekên din de hebûya wê gerdûn tevlihev bikirina. Hêzeke xurt... li nik tu kesî tune ye, hinavên me de veşartî ye. Pirsgirêkên rojane pirin. Divê em li pey tiştên biçûk nekevin. Divê pariyê mezin hertim behra me bê. Em xwe li pariyê biçûk qayil bikin. Wê hignê ew parî bibe stîrî di gewriya me de asê bimîne. Zorê bide canê me ew halê ku niha em tê de (kê min ev çi pirderengî ye, we guhên min birin. Ev galegala we, wekî dendikekê jî valabûna diranê dijmin danagire. Hûn çima me jî bêzar dikin. Belengaz jî ne wekî we ne!)

Ma qey emê hertim belengaz bin li ser rûyê wê gerdûnê. Ez serê xwe radikim, li derûdora xwe dinihêrim, çi bibînim... her seriyekî dengê jê tê. Guhê xwe beloq dikim. Çi bibihîsim... ji paşketinê wêde ne tiştêkî dine.

Nêrînen tûj... kesên sexte... peyvên pûç û hêviyê bêtawî li ser rûyê van mirovan digere. Di çavên hemûyan de bêzarbûnek diçirûse li ser xaka pîroz û nelewî. Ew hêstirên çavan yên ji taqet ketî, nikarin çareseriyê binin ji min re delala min! Divê tu werî, min bibînî, bibihîsî, bêhn bikî û di hembêza xwe de veşêrî. Xelasbûn tenê wisa çêdibe. Ji bilî wê yekê windabûn li ber deriyê me ye. Li benda fersendê ye. Delala min çavên xwe veke. Li dora xwe binihêre. Gurên devbixwîn li kêleka te sekinîne. Deng ji te nayê. Wê te bikin çar perçe li ser dinê belav bikin.

Ax pênûsa min! Nesequine, binivîse. Ew peyva ku tu binivîsî hertim guleyê li hember dijmin sekinîye. Ger guleyên me zêdebin, serkeftin para me ye pênûsa min binivîse....

Ez nahêlim hibra te ziwa bibe. Lewre ez dizanim dema hibra te ziwa bibe, wekî ku dareke di nava çolistanê de mayî, hişkbibî. Wê tu yê jî hişk bibî. Nikarî jiyane bidî xaka pîroz. Pênûsa min, xaka pîroz bê te nabe. Milekî berfa spî ku di hundirê xwe de Berfînên rengîn dihevine. Milekî ava şîn wekî ji behrê anîn li vir danîn. Milekî tîrêjên roja pîroz li ser xaka gewr. Milekî ji xwezaya welatê min. Li hember ew qas delalîyan, ma qey tu dikarî bisekinî û nenivîsî pênûsa min! Ne tu... tu ew qas cegerpolayî, xwe ragirî.

Negirî helbestvanê delal. Ev hêstirên çavên te wê bibin roj; biherikin, bikişin ber bi deryaya bêbinî ve daliqin. Ev roj dema bigihîjin hev, wê hêza rondikên çavên te birengînin helbestvano! Dema hezkiriyên te rondikên şelû dibînin, xwe nagirin, digirîn. Bizane helbestvano!..tu rastiya rastiyan î. Tu nikarî xwe ji lorîna hestên welatê xwe bepar bihêlî.

Li ber helbestên te keçikeke rindik hêstirên ziwa dibarîne bi dilekî xemgîn. Bizane helbestvano!..jiyan pir rengîn e. Çiqas rengîn be jî bê stîrî nabe... ❖

## Navên kulilkan

Êhmed DIRIH

Navên kurdî	Türkçe isimleri	Navên latîni
Bêhnxoş	Çelenk çiçeği	Hedycium
Bernixûn	Ters lale	Fritillaria
Beybûn	Papatya	Anthemis
Cehnemî	Gelin duvağı	Bougenvillea glabra
Dafne	Defne	Daphne kurdica
Dilê xwînî	Kız kalbi	Dicentra
Dargerîn	Ağaç sarmaşığı	Hedera
Guharok	Küpe çiçeği	Fuchisa x hybrida
Pîvok	Çiğdem	Crocus albiflorus
Gulbihar	Paskalya çiçeği	Gowann(ing)
Gulevîn	Afrika şefkatçiçeği	Agapanthus africanus
Hîro	Hatmi çiçeği	Alcea kurdica
Kevokî	Haseki küpesi	Aquilegia
Kulilka gulanê	İnci çiçeği	Convallarina majalis
Kumsor	Begonya	Begonia
Mêx	Bahçe karanfili	Dianthus caryophyllus
Orkîde	Kürt orkidesi	Cephalaria kurdica
Simbilavî	Su sümbülü	Eichornia
Kulilka qesar	Yayla çiçeği	Helicbrysum plicatum
Dolber	Hint yasemini	Poltiantbes tuberosa
Gulhenar	Nar çiçeği	Primula
Gul	Gül	Rosa canina
Şîlan	Kuşburnu	Rosa canina
Gula rojhilat	Fenike gültü	Silene
Leylaq	Leylak	Tagetes
Giyaqepûşk	Cezayir menekşesi	Vinca herbacea
Binevş	Menekşe	Viola sylvestris
Gîldar	Kartopu	Vinca
Derziya ademî	Avize çiçeği	Yucca gloriosa
Sensor	Hakiki zencefil	Zinnia elegans
Galêv	Çuha çiçeği	Ranunculus polyanthemus
Rebenok	Güneş gözü	Turipa retroflexa
Gulsosin	Yasemin çiçeği	Syringa
Fisaheş	Şebnem	Drosera rotundifolia
Nêrgîz	Nergis	Narcissus
Sêbiske	Horozbibigi çiçeği	Celosia cristata
Şevgul	Gece yasemini	Cestrum nocturnum
Nefel	Yonca	Tropaelum peregrinum
Newroz	Nevruz çiçeği	Linaria kurdica
Sosin	Zambak	Lilium
Zimanê xesiyê	Kaktüs	Cactus
Gulehingivîn	Hanumeli	Lonicera
Ziqqûm	Zakkum	Nerium oleander
Bûkik	Gelincik	Papaver rhoeas
Endilko	Santaş yoncası	Melilotus officinalis
Zengilok	Çan çiçeği	Campanula bakkiarica

# Diyarbakır Kalesinin Tarihi Seyri



Diyarbakır kalesinin, ne zaman yapıldığı kesin olarak bilinmemektedir. Şehrin doğusunu sınırlandıran "Fis Kayası" isimli sarp kayalığın İçkale kesiminin buranın ilk yerleşme yeri olarak çekirdeği oluşturduğu ve küçük çapta bir kalenin burada Hurriler zamanında inşa edildiği sanılmaktadır (A).

349 senesinde Roma İmparatoru Constatinus döneminde şehrin etrafı surla çevrilerek ve sürekli saldırılarla zedelenen kalesi yeniden tamir ve tahkim edilerek savunma gücü artırıldı. Bu sur, şimdiki surun doğu, yani; Mardin Kapısı'ndan Yenikapı'ya ve buradan Dağ Kapısı'na kadar uzayan kısımdır. Kalenin batı surları ise yaklaşık olarak bugünkü Gazi Caddesi'nin yerine rastlıyordu (B). 367-375 yılları arasında şehrin batı surları yıkılarak bugünkü Dağ Kapı'sından Urfa Kapı'sına ve buradan Mardin Kapısı'na giden sur kısmı inşa edilmek suretiyle kale genişletildi (C). Surlar VI. yüzyılda Bizans İmparatoru Justinianus zamanında güçlendirildi. Böylece son şeklini alan Diyarbakır kalesi, sonradan şehre egemen olan devletler tarafından zaman zaman tamir ve tahkim edile gününüze kadar ulaştı.

Genel görünümü ile bir "Kalkan Balığı"na andıran kale, Dışkale ve İçkale olarak ikiye ayrılır. Muhtelif zamanlarda onarılmış veya yapılmış 82 burçlu Dışkale surlarının uzunluğu 5 km. kadardır. Surların kuşattığı alan, doğudan batıya 1700, kuzeyden güneye 1300 metreyi bulur. Surların yerden yüksekliği bugünkü haliyle 8-12 metre ve duvar kalınlığı 3-5 metre arasında değişir. Burçlar çoğunlukla değirmiş, dört köşedir, birkaç tanesi çok köşelidir. Burçlar iki katlıdır. Alt katları depo olarak kullanılırdı. Üst katlarda ise harp zamanında kaleyi savunan askerler kalırdı.

Dışkale'nin dört yöne açılan dört önemli kapısı vardı: Kuzeyde Dağ (eskiden Harput) Kapısı, batıda Urfa (eskiden Rum veya Anadolu Kapısı), güneyde Mardin (eskiden Tell) Kapısı, Doğuda Yenikapı (Dicle yahut Şatt kapısı) bulunurdu. Hindibaba Kapısı (Çiftkapı) ile Tekkapı son zamanlarda açılmış iki yeni kapıdır. Kara bazalttan yapılmış bu surlar uzunluk itibariyle Çin Seddinden sonra gelir, sağlamlıkları ise eşsizdir. Kapıların tamamı demirden olup gayet sağlam yapılmışlardır. Dışkale surlarını ikinci bir surun kuşattığı ve bu iki sur arasında ise hendek olduğu rivayet edilmektedir. Bu ikinci sur, 1 Ekim 1232 tarihinde kaleyi fetheden Eyyubi hükümdarı Melik Kamil tarafından yıkılarak taşları esas surun onarımında kullanılmıştır.

Surların bir başka özelliği ise "Kitabeler Müzesi" olmasıdır. Surlarda sırası ile şu kitabeler yer almaktadır: Latince Roma (367-375), Grekçe Bizans (449-528), Arapça Abbasi (909), Mervani (996-1035), Büyük Selçuklu (1088-1092), Şam Selçukluları (1093), İnal'lı (1141), Nisan'lı (1154-1183), Artuklu (1188-1208), Eyyubi(1236-1237), Akkoyunlu (1149-1479) ve Farsça Osmanlı (1525-1527). ❖



"Cihan şin e

Mîna portaqalê

Kî dikare li dijî vê angaşê derbikeve."

Paule Eluarde

**PORTAKAL**  
KİTAP

A D R E S

Tlf.: .412.224 69 99  
Kooperatif Mahallesi  
Şair Sırrı Hanım Sok.  
Ustabaşı Apt. Kat: 1/3  
Ofis/DIYARBAKIR  
portakalkitap@yahoo.com



*Apê Feqî,  
Tu yê her dem di dilên  
şagirtên xwe de bî...*





*Apê Feqî,  
Tu yê her dem di dilên  
şagirtên xwe de bî...*

